

PEYAMA Kurd


Hejmar 56 | 30.09.2005

Kurdish weekly newspaper

Em xwe ji Erebb, Tirk û Farisan kêmtir nabînin

■ Di diwemîn roja Festîvala Duhokê ya rewşenbîrî de Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî beşdarî kombûna rewşenbîran bû û axaftineke balkêş kir.

Rûpel 6



Nûnerên PDK-Bakur: Ewropa Tirkîyê jibo endametiye qebûl nake

Rûpel 5

Dr. Herbert Fritz: Divê dewleteke Kurd were damezirandin

Rûpel 4

Ji her 10 zarokan 4 heb
xizan ji dayik dibin

Rûpel 2

Bela kes bê goşt
nemîne!

Rûpel 3

Helîm Yûsiv:
Ez nenîvisînim,
ezê mirar herim

Rûpel 8-9

KOMKAR-Almanya
kongre xo ya 19. viraşt

Rûpel 16

Laetitia Casta

Rûpel 12



Tirkîyê ji Krîterên „Anqerê“ nehat xwarê, lê...

■ Di 3ê mehê de Yekîtiya Ewrûpa (YE) wê biryarê bide ka ewê jibo endametiye bi Tirkîyê re dest bi muzakereyan bike an na.

■ Di dîroka YE de heta niha li ser endametiya tu welatî bi qasî ya Tirkîyê nîqaş nebû û serêşî derneket


Rûpel 6



D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1.70 EUR



Jibo çi mirov bêtir ji talûkê hez dikin?



PK - Jibo çi hin mirov ji xir û cirê, ji pevçûn û lêdanan, ji şer û telûkê hez dikin û hin kes ji van taybetiyan dûr in? Belkî di pêvajoya hemû dîrokê de însan li ser vê pirsê sekinîne û li bersiva wê geriyane. Li rojhilat ev taybetî bi awayekî erênî tê nirxandin, li rojava insaan ji kesên ku li bela û pevçûnan digerin, direvin.

Zanyarî sal bi sal mijarên ku ji aliyê însan ve nayên famkirin ronî dîke.

Lêkolînanên Amerîkî genek ku tevgerên bi talûke kontrol dike kifş kirin. Dr. James ku serokatiya heyeta vê lêkolîne dike diyar kir ku ev gena bi navê Neuro D2 êşkere dike ku jibo çi hin însan ji yên din bêtir xwe davêjin nav talûkê.

Lêkolîna ku li bajarê Seattle li Navenda Hutchinsonê hatiye kirin, derdixê holê ku ev Neuro D2 bi pêşketina di mejiyê însan de bi herêma amigdal ve girêdayî ye û di reaksiyonên ku mejî dide tirsê de rolekî girîng dileyize.

Ev herêma amigdal di mejiyê însan de bi qasî guzekê ye. Kesên ku di mejiyê wî/wê de amigdal pêşketina xwe temam kiribe her ji xwe re rîya ewle hildibijêre, yên din tiştan tevlihev dikin û gelek caran rîya bi talûke an ne rast tercîh dikin.

Ji her 10 zarokan 4 heb xizan ji dayik dibin


PK - Berhevdana lêkolînan ku ji aliyê saziyên cuda ve hatine kirin, li dinyayê û Kurdistanê xizaniya mirovan bi awayekî balkêş derdixê holê. Li gora agahdariyên Programa pêşveçûyîna ya Neteweyên Yekbûyî (UNDP) li dinyayê 1.2 milyar mirov rojê 1 dolarî û 2.8 milyar mirov jî di bin 2 dolaran de bi dest naxe û ji her 10 kesên 4 kes di nav tunebûnê de çavê xwe li vê dinyayê vedike. Li gora agahdariyên Komela pişesaz (senayîvan) û karmendên Rojhilat û Başûrrojhilat (Kurdistanê Bakur) (DOGÛNSIFED) ferqa dahatîya di navbera Marmara û Kurdistanê de 5 qat e.

Li gora îstatîstîkên UNDPê li dinyayê ji her 10 zarokan 4 zarok xizan jidayik dibin û ji sedî 40ê zarokên ku hene ango 500 milyon zarok di rojê de bi pereyekî kêmtirî 1 dolarî debara xwe dikin.

Li gora agahdariyên Rêxistina plangerî ya dewletê (DPT) li Tirkiyê, li herêmên Kurdistanê ji sedî 25ê zarokan bi qasî ku jê re pêwîste xwarin û vexwarinê bidest naxe.

Serokê DOGÛNSIFEDê Şeyhmus Akbaş êşkere kir ku li seranserê Tirkiyê ji sedî 2.4ê xelkê, di rojê de dibin dolarekî re û ji sedî 18ê nifûsê di bin 2 dolara re debara xwe dike. Li gora DPTê li Tirkiyê 20 milyon mirov di nav xizaniyê de dijîn û ev reqem, ligel ku aboriya Tirkiyê her sal mezin dibe, zêdetir dibe.

Di navbera herêmên Kurdistanê û Tirkiyê de, di vê mijarê de cu-



dayîyek mezin heye. Reqemên DOGÛNSIFED êşkere dike ku hatiniya

herêma Marmarayê pênc cara ji ya Kurdistanê bêtir e.

Sendroma mirovê gur



PK - Li Amerîkayê malbateke ku ji 16 kesan pêk tê bi "Sendroma mirovê gur" ketin û bi awayekî nenormal bi pirç bûn.

Sendroma mirovê gur nexweşiyekê bi hormonan ve girêdayî ye û ji 10 milyaran carekê derdixê holê. Ji malbatê bi taybetî Jesus Aceves yê 31 salî bi rûyê xwe yê wek guran li xwe heyirî ye û wan kesên ku wî dibînin şaş dîke û ditirsîne.

Aceves henekan dike û dibêje "hinek kes wexta min dibînin, dibêjin qey min rûyê xwe meqyaj kiriye".

Aceves zewicî ye û xwediyê 3 zaroka ye. Ew qet ji vê rewşa xwe gazinca nake, rewşa xwe qebûl kiriye û bi xwe re lihevdu hatiye. Ew êşkere dike ku ji rûyê xwe şerm nake û jiber ku Xwedê ew cuda afirandiye, kêfxweş e.

Mezintirîn pirsgirêk û gazinca Aceves ew e ku di dîtina kar de alozî û astengiyan dikîşîne.

Ev çibû Leonardo da Vinci?

PK - Nedihat ser hişê tukesî ku rojekê ji rojan hevrikek ji Mona Lisa re derkeve! Di mehên pêşiya me de wê cara yekem tabloyek bi navê "Maria Magdalena" derkeve pêşiya heyranên risim ku dikare gelek tiştan bîne rojevê û li ser nîqaş bê kirin. Li gora dîrokzanê hunerê yê Zanîngeha Kaliforniya Carlo Pedretti ev tabloya bê îmze ya Leonardo da Vinci bixwe ye. Pedretti difikire ku Vinci "Maria Magdalena" di sala 1515an de berî mirina xwe bi çar sala, bi xwendekarekî xwe re çêkiriye.

Di dinya Xristiyanî de mijara Îsa Pêxember û Maria Magdalena her bûye sebebê nîqaşên dijwar.

Li gorî gelek pisporan di tabloya da Vinci ya bi navê "Îsa û 12 hewariyên xwe" de Maria Magda-



lena li destê rastê yê Îsa rûniştî ye.

Jin ji mêrên sîmetrîk hez dikin

PK - Lêkolîneke Zanîngeha New Meksîko êşkere kir ku mêr ji jinên keş û jin jî ji mêrên sîmetrîk hez dikin. Bi taybetî di demên xwe yên ducaniyê de meyla jinan diçe ser mêrên sîmetrîk.

Zilamên xwedî bedenek asîmetrîk li xwe miqatebin. Lêkolîne raxist ber çavan ku jinên bi partnerên asîmetrîk di hin rojên mehê de dikarin bala xwe bidin ser mêrên sîmetrîk. Lê, ev meyl li gel jinên ku partnerên wan xwediyê bedenek sîmetrîk in nehat dîtîn. Ev daxwazek ne bi zanebûn e. Di demên ovulasyonê de jin, li genên rast digerin û tercîhên wan li ser mêran tê guhertin.

Ya balkêş ew e di vê dema xwe de rengê çerm û lêvên jinan jî ten guhertin û rûyên wan bi xwe jî formekî sîmetrîk distîne.

Lêkolîna ku li ser 54 jin û mêran hat kirin êşkere kir ku jin bi giştî partnerê xwe ji mêrên din dîlkêştir dibînin.

Lêkolînan berê jî hatibûn kirin, diyarkiribûn ku jin bi lêgerîna genên çêtir, meyla xwe didin ser mêrên ku bi wan xweşik xuya dibin.

Bela kes bê goşt nemîne!

PK - Serokê Odeya Qesabên Amedê Saît Şanli, bi navê "Bela malek bi tenê jî bê goşt nemîne" dest bi kampanyayekê kir.


Saît Şanli yê ku di haşkirina şerên eşîrî yê herêmê de roleke mezin lîstibû û ji aliyê Ajansa Nûçeyên Frênsawî (AFP) ve weke berendamê xelata Nobelê hatibû nîşandan, dixwaze di meha Remezanê de, xwarina goşt ji bo herkesî asan bike.

Saît Şanli berî niha jî ketibû navbera 2 eşîrên xwîniyên hev û ew li hev anî bûn. Şanli dixwaze bi alîkariya hemwelatî û dewlemendên herêmê, di meha Remezanê de goşt bide 200 hezar malbatên xizan.

Şanli di derbarê vê kampanyayê de civînek lidar xist û agahdarî dan

çapemeniyê. Li gora Şanli ji sedî 60ê Amediyan bi tenê di cejnên de goşt dixwin. Ew dixwazin di meha Remezanê de, heftiyê carekê duwaran 2 kîlo goşt bidin wan malbatên xizan yê ku nikarin goşt bikirin. Li gora Şanli, dewlemendek bi navê Mûcahit Can bi 300 pezî tevî kampanyayê bûye.

Li Ameda ku herroj xizantir dibe, 5-6 hezar zarokên kolanan hene. Hemwelatîyên ku bixwazin tevî kampanyayê bibin, wê pezên wan ji aliyê Odeya Qesaban ve belaş werin serjêkirin û wê goşt ji



aliyê muxtaran ve li ser xizanan were belavkirin.

Panorama

Dîlbixwîn Dara



Festîvala Duhokê: "Kurdî sînoran derbas dike!"

Di navbera 22-24.09.05 de li başûrê Kurdistanê li bajarê Duhokê festîvaleke rewşenbîrî pêk hat.

Festîval di bin vî dirûşmeyê de çêbû: "Kurdî sînoran derbas dike!"

Ev yekemîn car bû ku ji her çar perçeyên Kurdistanê ji sedî zêdetir rewşenbîrî û nivîskarên Kurd, li Duhoka ku di her çar demsalan de şîn û xemilandîye, li hev dicivin û yek ji mezintirîn komcivîna rewşenbîrî lidardixin.

Li gora ku min bihist Duhokiyên mazûbaniyê ke pir baş pêşkêşî mêvanên xwe kirine.

Keda kek Hesen Silêvanî di amadekirina vê festîvalê de bêguman gelekî mezin e. Ew bi xwe serokê şaxê Yekîtiya Nivîskarên Kurde li Duhokê. Dema ku berî niha ez li navenda yekîtiyê bûme mêvanê wî, ew di heyecan û keftelefa amadekirina vê festîvalê de bû, got: "Eger ku parêzgerê Duhokê kek Temir Remezan barê festîvalê hilgire ser milê xwe, emê bi sedan nivîskar û rewşenbîran binin cem hev û belkî mezintirîn festîvala rewşenbîrî li darxinin..." Ew ji bo pêkanîna vê festîvalê gelekî bi hevî bû.

Parêzgerê Duhokê îmzeya xwe avête bin û bi rastî ji festîvaleke mezin lidarket.

Çêkirina festîvaleke ewqas mezin, ku bi dehan rewşenbîrî û nivîskar ji Kurdistanê, Ewropa, Tîrkiyê, Iran, Suriyê û heya bi Australya beşdar bibin û di bin ala Kurdistanê de bi awayekî azad û serbest kom bibin, ne tişteki biçûk e.

Ev yekemîn tecrubeye ku li Kurdistanê çêdibe. Berî niha li Diyarbekir û Batmanê ji festîvalên bi vî rengî çêbûne, lê ew festîval di bin hukmê partî û rêxistinên siyasî de çêbûne. Kesên nêzîkî partiyên ku ew festîval amade kirine beşdar bûne û berhemên xwe xwendine. Ji ber vê yekê gelek nivîskar û rewşenbîrên xwedan berhemên heja li derveyî wê çalakiyê mane. Her wiha ew festîvalên li bakur, ji armancên wejeyî û rewşenbîrî bêhtir bi armancên siyasî û bi taybetî ji bo parastina siyaseta partiyekê du partiyên çêbûne.

Festîvala Duhokê îspat kir ku ji siyaseta nerîn û hizrên cuda ronakbîrên Kurd dikarin werin cem hev, dikarin li hev guhdari bikin, dikarin bi hev re pirsgrêkan gotûbêj bikin û di pirsên hevbeş de her çiqas ne di heman nêrinê de bin jî, dikarin di platformekê de cih bigirin.

"Kurdî sînoran derbas dike!" Belê, di Festîvala Duhokê de kurdî hemû sînorên ku heya niha hebûn û li pêşya gelek pêşketinan asteng bûn, derbas kirin.

Dostekî ji min re got ku ji aliyê rêxistinî ve hinek kêmasî hebûn, lê di herdu rojên dawiyê de ew hatine çareserkirin.

Bi hevî me, di pêşerojê de sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, PENa Kurd û gelek demûdezegehên me yê li penaberiyê, bikaribin xwe bigihînin welat û festîvalên wiha dewlemend li darxinin.

Careke din, destên wan kesên ku di amadekirin û birêvebirina Festîvala Duhokê de westa bûne û sînorên li pêşya kurdî rakirine sax be û mala wan ava be.

Mêvaneke Festîvala Duhokê bû dayik!

Evro (Duhok) - Rojnamevana Kurd Zahide Ehmed Şêxo ku ji başûrêrojavyê Kurdistanê ji bajarê Serêkaniyê ye yek ji mêvanên Festîvala Duhokê ya Rewşenbîrî bû. Di yekem roja festîvalê de ket nexweşxaneyê û zarokê kur anî dinyayê. Navê wî kirin 'Serwan'. Di derbarê vê yekê de Zahide Ehmed Şêxo got: "Civan ew bû ku zarokê min di meha dehan de çêbibe, lê ez gelekî ji Duhokê hez dikim û kêfxweşim ku zarokê min li vir çêbû. Bi rastî min xwe berhev dikir ku ez piştî festîvalê biçim Suriyê û zarokê min li wir çêbibe".

Zahide, hevîna nivîskar û rojnamevan Dildar Şêxo ye û ev dehan meh in li bajarê Silêmaniyê dijîn.



Erxenî li ku, Berlîn li ku



PK - Li Erxeniyê Amedê, hisreta 29 salan bi dawî bû. Bavê ku piştî 29 salan giha kurê xwe di nava hêsrên çavan de fetisî.

Mehmet İpek di sala 1971ê de ji bo gerê çû Berlîna Elmanyayê û li wir ma. Ji bo ku bikaribe li Elmanya bimîne ew li gel xanimeke Elman ya bi navê Gizilla zewicî. Piştî 4 salan vegeriya Erxeniyê û pê hisiya ku kurekî wî ji xanima wî ya Elman çêbûye. Di sala 1980î de ji bo dîtina kurê xwe, di navbera Tîrkiyê, Mîlano, û Swîsreyê de çû û hat, lê nikaribû xwe bigihîne Berlînê. Wî ji bo dîtina kurê xwe serî li her derê da, lê tu encam wernegirtin. 29 salan ji hev dûr man.

Mehmet İpek li Erxeniyê di sala 1981ê de li gel xanimeke Kurd zewicî û bû xwediyê 2 kurên din. Wî herdemê ji zarokên xwe re behsa birayê wan yê li Elmanyayê dikir. Kurê Mehmet yê bi navê Ejder ji bo dîtina birayê xwe peyamek rêkir qenaleke televizyonê û alîkarî ji wan xwest. Di encama lêkolînên amadekarên bernameya televizyonê de Micro Mehmet İpekê 29 salî hat dîtina ew birin Erxeniyê.

Mehmet İpek û kurê xwe Mirco Mehmet İpek, piştî 29 salan gihan hev. Lê mixabin ew ji zimanê hev fêhm nakin û mecbûr in bi riya wergêrekî derdê xwe ji hev re bibêjin.

Ji zikê keçekê kîsîkekî bi giraniya 12 kîloyan derket

PK - Li Amedê, ji zikê keçekê 17 salî kîsîkekî bi giraniya 12 kîlo û nîvan hat derxistin. Keçika bi navê R.F. ji aliyê malbata wê ve, bi gazincên weke zikêşê û nepixandina aşîkê xwarinê rakirin nexweşxanê. Ew li nexweşxaneyê ji aliyê doktoran ve hat saxtîkirin û yekser xistin emeliyatê. Di dema emeliyatê de, doktor û alîkarên xwe li beramberî kîsîkê di zikê keçekê de mat man.


Dr. Mehmet Ekmen dide zanîn ku ew 3 seetan di odeya emeliyatê de mane û di encamê de kîsîkê di zikê keçekê de derxistine.

Dr. Ekmen dibêje ku çihana tibbê kêman dibe şahidê bûyereke wiha xerîb û ew gelekî lebkîne heta ku wan kîsîkî biçûk kiriye û derxistine. Li gora daxuyaniya doktoran rewşa keçikê baş e û kîsîkê ku ji nava wê hatiye derxistin ji tê saxtîkirin.

Ji ber rêwî-
tiyekê gotara
nivîskarê me
negihîştî destê
me.

Nejdet Buldan

hbcw@hbcw.com



Çekdarên PKKê rê li projektên hikûmeta Kurdistanê digirin!

PK - Ev çend roj in çekdarên PKKê rê li ber vekirina du cadeyên mezin digirin û nahêlin hikûmeta Kurdistanê ji bo avakirina deverên weke "Nêrwe û Rêkan" riyan veke. Ev dever di dema rejîma Seddam Hisên de hatibûn xirabkirin. Hêjayî gotinê ye ku ev bêtirî deh salane hikûmeta Kurdistanê hewl dide ku cadeyan bigihîne devera Berwariyan jî, lê mixabin çekdarên PKKê nahêlin ev projekt çibicî bibin, loma ta niha ew dever avedan nebûne!

Serokê dadgeha dadgehkirina Seddam Kurd e!

PK - Rojnameya Evro nûçeyek belavkiriye û tede eşkere dika ku serokê dadgeha dadgehkirina Seddam Hisên, Kurd e û navê wî jî "Rizgar Emîn" e.

Hêjayî gotinê ye ku dadgehkirina Seddam Hisên wê di 19ê meha Oktoberê de dest pê bike, dadgehkirin jî wek hatiye eşkerekirin wê bi awayekî eşkere û zindî be û wê kesûkarên qurbanîyan, dîdevan û kesûkarên Seddam jî tede amade bin. Lê saeta dadgehkirinê nehatiye diyarkirin.

Mêrekî bi guleyên demançê bersiva "zimandirêjîya" jina xwe da!

PK - Heftiya derbasbûyî, zilamekî Duhokî ligel hevjin 'xanim'a xwe ji seyranekê ji bajarê Amêdiyê dihatin mal, berî bigihîjin mal şeredev (şerê devkî) dinavbera wan de çêbû, zilamî jî ji nişkê ve demançeya xwe anî der û bi guleyan bersiva "zimandirêjîyên" hevjinê xwe da. Di encam de jina wî bi giranî birindar bû û jibo nexweşxaneyê hat rawanekirin. Niha jî ji aliyê polîsan ve lêkolîn tê kirin û zilam jî di zindanê de ye.

Du keçên Hewlêrî xwe şewitandin!

PK - Li gora nûçeyê rojnameya Aso, keçê Hewlêrî, piştî ku dayik û bavê wê rê nedanê ku ew xwendina xwe temam bike, wê xwe di nava malê de şewitand û piştî çend demjimêran giyanê xwe ji dest da. Ji aliyê din ve li bajarkê Seyid Sadiq yê girêdayî Hewlêrê jî xwendevaneke pola siyê navincî agir berda xwe û piştî heftiyekê wê jî giyanê xwe ji dest da. Wek hatiye zanîn, hokarên xweşewitandina wê jî, ew bûn ku dayik û bavê wê rê li ber berdewamkirina xwendina wê girtibûn.!

Dr. Herbert Fritz:

Divê dewleteke Kurd were damezirandin

National - Zeitung: *Zirveya Yekitiya Ewropa (YE) di 17.12.2004 an de ji bo destpêkirina mizakereyan tarîx da Tirkîyê. Bi vê ve girêdayî YE talîmat da Tirkîyê ku hin reforman bi cih bîne. Tirkîyê di pirsgrêka Kurd de hinek tişt ji bingehê ve guhertiye?*
Dr. Herbert Fritz: Qet tiştê nehatiye guherandin. Hinek zagon hatine guherandin. Lê bicîhanîna wan zagonan nehatiye garantîkirin. Burokrasî li dijî bicîhbûna wan zagonan disekine. Demek dirêje ku zimanê kurdî dikare were axavtin, lê ne bi awayekî fermî di daîreyên dewletê de. Kursên zimanê kurdî dikarin werin vekirin, lê ji bo karkirina wan asteng hene, azadiya wan pir hatiye bisînorkirin. Lê belê weke berê mirov nikare behsa mafê çarenûsiyê, xwe bi xwe îdarekirinê an jî otonomiyê bike.

Kurd tro li Tirkîyê wek gelekî serbixwe (Netewe) tên naskirin, an hîn jî wek Tirkên-çiyayî tên naskirin?

Ew edî ne Tirkên-çiyayî ne. Wekî diplomatekî Tirk berî demekê ji min re got; Kurd wek etnîsîte ne Tirk in, lê ew ne kêmnetew (Mînorîtât) in jî.

Tirkîyê carcaran li dijî kurdan çekên xwe yên he-wayî jî bikar anîn. Ew niha rawestiya ye?

Niha tiştêkî wisa nîne. Sebeba wê ewe ku PKK şkest û parçe bû. Parçeyek piçûk niha dibin serokatiya birayê Öcalan, Osman de ye û ji bo aştîyê têdikoşe. (Agahdariyên birêz Dr. Fritz kevn in. Qesda wî PWD-K ye. Lê Osman Öcalan niha ne bi PWD-K re ye. S.K) Beşekî din dixwaze dîsa dest bi şerê çekdarî bike.

Di dahatîyê de grûbên îslamî dikarin roleke girîng bilîzin?

Öcalan berî ku were girtin îslam piçekî zêde derxistibû pêş. Çimkî li Tirkîyê pêşeroja wê xetê heye. Cihê ku berê PKKê girtibû, mimkûne ku rojekê grûbêk îslamî bigre. PKK komunîst bû û berê hertişt li gor destûra: „Dijminê dijminê min dostê min e“ bi rê ve dibir. Tirkîyê hevkarê NATO ye, berê xwe daye

Li dawiyê divê dewletek Kurd were damezirandin. Di vê dema globalîzmê de jî hîna dewleta netewî formek îdeale ku gel bikaribin bidest bixin. Mafê çarenûsî hîna jî formeke herî baş ya prensîbên netewî ye. Niha dewletek Kurd ku hemû kurdan bigre nav xwe, wek şanseki realist xuya nake. Lê belê di sala 1988-an de, kê dikaribû bifikire ku di demeke nêzik de diwar hildiweşe? Dîsa jî ez di demeke diyarkirî de ji bo we şanseki nabînim. Bêguman Kurdîstana Başûr dikare destpêkek be, ango dikare „Piemonta kurd“ (1) be.



Dr. Herbert Fritz kî ye?

Dr. Herbert Fritz bi qasî sîh salî ye ku bi pirsgrêka Kurdî re mijûl dibe. Dr. Fritz beriya demekê bi navê „Trajediya Kurd: Gelek di navbera eniyên de“ pirtûkek derxist. Pirtûk jî 304 rûpelan pêk tê û bi wêneyên rengîn hatiye dewlemend kirin. Dr. Fritz di vê pirtûka xwe de ji bo kurdan wisa dinivîse: Kurd di şerê cîhanê yê yekemîn de jî aliyê hêzên serketî û hêzên serdest yên dinyayê ve hatin xapandin û îhanet kirin. Ev gelê mezin û bê dewlet jî bo damezirandina dewleta xwe û berdewamkirina jiyana xwe ya netewî têdikoşe.

rojawa, dijminê wê komunîzm bû. Ji bo xeta PKKê vê yeke ji sebebên îdeolojîk zêdetir rol list. Eger niha li Tirkîyê îslamîzm bi hêz be, mimkûne ku Kurd li Tirkîyê zêdetir karta îslamê bikar bînin. Lê vê gavê hîna rewş ne di vê astê de ye.

Mirov dikare niha li Tirkîyê behsa gelkujiya Kurdan bike?

Niha tiştêkî wisa tune ye. Gelkuji hat ajotin. Niha wisa xuya dika ku xetek nû heye.

Li gor dîtina we mirov dikare çekan bifiroşe Tirkîyê?

Ez bim, ezê tiştêkî wisa nekim. Tirkîyê niha sekiniye,

li benda pêwendiyên xwe û YEê ye, dixwaze bibîne ka ew pêwendî çawa encam dînin, ji ber wê tiştêkî nake. PKK an jî Kongra-Gel ku ew niha xwe wisa binav dikan, ji ber girtina Öcalan parçe bûye. Dibin şertên wiha de firotina çekan ji bo Tirkîyê bêguman xeter e.

Rewş dikare wisa were guherandin ku talûkeya komkujiyê weke komkujiya Ermenîyan ya sala 1915 derkeve holê?

Ez bawer nakim ku tiştêkî bi wê formê pêk were. Ermenî bi giştî hatin kuştin û sirgûnkirin. Li hemberî Kurdan, Tirkîyê vî karî herêmerê dika. Bi taybetî jî diçe

ser heremên ku li hemberî wan li berxwe didin. Gelek Kurd jî edî asîmîle bûne.

Di pirsgrêka kurd de divê Almanya û Awûstûrya helwesteke çawa bigrin?

Berî hertiştî divê ew ji bo mafê çarenûsî, ango otonomiyek rasteqîn helwestê bigrin. Ji bo bicîhanîna wê jî divê heta radeyekê li ser dewletên desthilatdar zext were danîn.

Ew çawa bibe? Mafê çarenûsî li 5 dewletên cuda ku Kurd tê de dijîn?

Li dawiyê divê dewletek Kurd were damezirandin. Di vê dema gloverbûnê (Globalîzm çagi) de jî hîna „dewleta netewî“ formek îdeale ku gel bikaribin bidest bixin. Mafê çarenûsî hîna jî formeke herî baş ya prensîbên netewî ye.

Ji aliyê geopolîtîk ve berjewendiyên kê di çêbûna dewletek Kurd de heye?

Yên tu kesî tune ne. Jixwe pirsgrêk jî di wê de ye.

Dîsa jî hûn dewletek Kurd ku hemû kurdan bigre nav xwe, wek şanseki realist dibînin?

Di sala 1988 an de, kê dikaribû bifikire ku wê di demeke nêzik de diwar hilweşe?

Lê dîsa jî ez di demeke diyarkirî de ji bo pêkhatina wê şanseki nabînim. Bêguman Kurdîstana Başûr dikare destpêkek be, ango dikare „Piemonta Kurd“ (1) be.

Hûn ji bo destpêkirina mizakereyan li gel Tirkîyê çî şîretê li zirveya YE dikin?

Ez li dijî mizakereyan im. Eger dîsa jî mizakere dest pê bikin, mixabin wisa xuya dika, divê ew mizakere bi awayekî otomofîk ji bo endambûna Tirkîyê ya YE, neyên ajotin.

(1) Piemont: Di dema Şerê Cîhanê yê Diwemîn de li dijî faşîzmê tevgera resîstanz ya Fransê li Piemontê destpê kir û ewder bû wek navenda berxwedanê.

Werger ji Almanî:
Seyidxan Kurij
Çavkanî:
National - Zeitung

Nûnerên PDK-Bakur: Ewropa Tirkîyê jibo endametiye qebûl nake

Piştî seredana Serokwezîrê Tirkan Erdogan jibo bajarê Amedê, li bakurê Kurdistanê hin guhertin çêbûne. Îca jibo bêtir agahdarbûn li ser van pêşatan, Namiq Hewramî hevpeyvînek li-gel Rojhat Amedî endamê dezgeha serokatiya Partiya Demokrata Kurdistan-Bakur û mamoste Seîd Çîçek endamê komîteya navendî saz kir.

Di serî de Rojhat Amedî di derbarê bûyerên vî dawiyê li bakur çêbûne got; „Jibo zanîna van bûyerên vî dawiyê li bakur çêbûne, pêwîste em dîroka wê pirsgirêkê bizanin. Helbet danpêdana îtirafa Serokwezîrê Tirkan ku dibêje pirsgirêka Kurdî heye û herwisa gotina wî ya ku dibêje divê ev pirsgirêk bêyî PKKê were çareser kirin, wateya xwe heye, jiber ku wî PKK wek nûnerê gelê Kurd nas nekir, lê ew bixwe xwe wisa nîşan didin. Piştî karên tund û tûj rûdan ku mixabin pêwîst bû rûnedin, çûnkî yên bi van karan radibin, bi milên tûndrê û şovenîstên Tirkan dibizivîn.

Mamoste Seîd Çîçek jî got; „Em nikarin bêjin dî hêzên tûndrê hene, jiber ku di bingeha xwe de, ew yek hêze, ew jî hêla Atatürk e. Helbet PKK, bi rîya Ebdulla Ocalan jî wan fermanan wê digire; dîsan PKK bi xwe jî sazîyeke mezine, du TV, rojnameyên rojane, heftename, mehane jî hene, rêxirawên civakî û karî jî hene, herwisa di her çar parçeyên Kurdistanê de partiyên sîber jî ji xwe re çêkirine û serokê hemûyan jî Ebdulla Ocalan e“.

Di derbarê helwesta partiyên din yên bakur de jibo daxuyaniyên Erdogan, birêz Amedî got; „Me weke PDK-bakur pê



Endamê Komîta Navendî yê PDK-Bakur Rojhat Amedî


xweş bû em danûstandinê li ser daxuyaniyên Erdogan bikin, lê mixabin di nav siyasemedarên bakur bi xwe de, ew danûstandin dirust nebû. Jiber ku ta niha PKK serokê doza Kurd dike û serokê PKKê fermanan jî sazîyên eskerî yên Tirk wê digire, çûnkî karê dewleta Tirk bi PKKê heye. Îca rê nade ti alternatîfêke din jî.

Dîsa di derbarê hoyên ku li piştî daxuyaniyên Erdogan bûn, mamoste Çîçek got; „Jibo ku partiya Erdogan li ser desthelatdariyê bimîne, pêwîste ew hin tiştan bike, yek jî wan karan jî aramiye li Tirkîyê, helbet bê çareser kirina pirsgirêka Kurd aramî jî dirust nabe.

Li ser pirsê Kurd û projekta Rojhilata navîn ya mezin, birêz Amedî got; „Divê em bizanin bo çî Erdogan di vî qonaxê de, behsa pirsgirêka Kurd dike, bêguman hokarê bingehîn, civîna Yekîtiya Ewropayê li 30ê Oktober, li ser meseleya endambûna Tirkîyê di yekîtiyê de. Erdogan jî hewil

dide pêngaveke demokratîk bavêje ku bibe cîyê razîbûna Yekîtiya Ewropa û Emerîka. Hin alî û jî wana esker jî, hez nakin ku Tirkîyê bibe endam di yekîtiyê de û Erdogan jî vî baş dizane.

Li dawiyê jî mamoste Seîd Çîçek li ser meseleya Endambûna Tirkîyê di Yekîtiya Ewropa de got; „Ez bawer nakim ti carî Tirkîyê bibe endam di Yekîtiya Ewropa de û ev xewne Tirkîyê dibîne“. Di derbarê heman mijarê de, birêz Amedî got; „Xuyaye endambûna Tirkîyê di Yekîtiya Ewropa de, misoger kirin û parastina sînoren cografîyên Tirkîyê ne û ev jî ne di berjewendîya Kurdan de ye, çûnkî pirsgirêka Kurd tenê bi guhertina nexşeya coğrafî çareser dibe, xuyaye ku di Tirkîyê de du boçûn hene, yek jî wan bawerî bi mana Tirkîyê heye, ew jî xeta Kemalîstane û ya din hikûmeta Erdogane ku dixwaze çak-sazî û demokrasîyê bike, loma ez bawer nakim ku Tirkîyê rojekê jî rojan mîna Yûnan û Îtalya di Yekîtiya Ewropa de bibe endam!.



nirxandin
Ömer ÖZMEN

DI NEWALA DOLABAN DE KONFERANSA "ERMENIYÊN OSMANIYAN"

Ji bo mafê kêmnetewa, dema ku zexta, dewletên rojava, li ser Osmaniyan zêde dibin, rayedarên Osmaniyan, mecbûr dibin „Fermana Mesrûtiyet“ê îlan dikin. Li gorî îlana Mesrûtiyetê, prensîbên exawetê (birayeti), Hurrîyetê (Azadî) Musawatê (wekhevî) û edaletê, ji terefên rayedarên Osmaniyan ve tîr pejirandin. Têlalen Osmaniyan, li kolanan bangî gel dikin û dibêjin: „Ji vir şûn de, ji kafira re, kafirgotin qedexeye“ Lê mixabin, gelê Ermenî, 6 salan piştî vî fermanê, ji komkujîyê rizgar nabe.

Encama komkujîya Ermenîyan û Şerê Cihanê yê Yekemîn; di heman demê de; bû sedemên rûxandina Împaratoriya Osmaniyan.

Rûxandina Împaratoriya Osmaniyan, ne tenê ji guhertina nexşeya heremê re serkanîti kir, tovê nijatperestîyê û barbarîyê jî, di nava gelan de çand.

Polîtîka komkujîya Ermenîyan, bê navber li ser netewa Kurd, hat berdewam kirin. Dijminahiya gelên Kurd û Ermenî, ji hemî desthilatdarên Tirk re, bû wek îbadet.

Di pêvajoya endametiya Yekîtiya Ewropayê de, piştî gelek gengeşîyan, roja 23-24ê meha îlonê de, konferansa komkujîya Ermenîyan, li Stenbolê hat pêkanîn. Rastlêhatîneke cudarengê; Navê cihê ku konferans lê civiyaye, kampusaku, „Newala dolaba“ ye. (Dolab dere). Xuya ye, cambazên Tirk, di newala dolaban de, dolabên nuh digerin.

Di serî de, navê konferansê jî, bi fêlbazî hatiye hilbijartin. Xwedêgiravî kesên akademîsyen, li ser zanariya dîrokê û sosyolojîyê leyistik çêkirin. Konferansêk li ser komkujîya siyasî; „Di pêvajoya rûxandina Împaratoriya Ermenîyan Osmaniyan“ binavkirin Ev argument, wek „Kurdên Tirk“ di pêvajoya inkarkirina netewa Kurd de dihat bikaranîn.

Berî ku konferans destpê bike, dewleta kur jî, çalekiyên xwe amade kiribûn. Rojek berî destpêkirina konferansê, Dadgeha îdarî; li ser siparîşa dewleta kur jî nişka ve, biryara qedexekirina konferansê derxist. Ev biryara dadgehê, tenê bi serê xwe, li Tirkîyê, mafyatîkbûna sistema hîquqê destnîşan dike.

Çarmedorê zanîngeha Bilgî yê, ji terefên grubên cerdevan, polis û faşîstan ve hatibû dagirkirin. Akademîsyenên beşdarvan, dibin dijwariyek psikolojîk de, dest bi konferansê kirin. Baş dihat dîtin ku, ev çalekiyana, ji bo nêtralizekirina naveroka konferansê, bi taybetî hatibûn amadekirin.

Bêguman, ji bo pejirandin û îtirafkirina komkujîyê; guftûgo û niqas, li ser rayagîstî testrek pozîtîf diafirîne. Lê divê ev guftûgo û niqas, di atmosfereki azad de werin zimên. Organîzekirina biryara dadgeha îdarî û êrîşkirina grubên faşîst destnîşan dike ku rayedarên Tirk, hîn ji vî armancê dûr in. Desthilatdar û çapemeniya Tirk, li ser naveroka konferansê ranawestî. Di navenda propaganda wan de; xapandina rayagîstîya cihanê cih girtî ye. Argumentên wan, ne liser komkujîyê ne. Tenê dibêjin „Ger ev konferans bihata astengkirin, ewê Tirkîyê, di pêvajoya Yekîtiya Ewropayê de tîketa tengezariyê.“

Demek dirêje, di qada diplomasiyê de, Serokkomarê Tirk û xariciya Tirk dibêjin, „Divê em pirsgirêka Ermenîyan jî dîrozkana re bibêlîn.“ Di biryara Dadgeha Stenbolê de, îspat bûye ku; Dewleta Tirk, dîrozkana jî, hewaleyi dadgehê dike.

Ev helwesta dewleta Tirk û organîzekirina çalekiyên nijatperest dide xuyakirin ku, zihniyeta komkujîya Ermenîyan, hîn li Tirkîyê berdewame. Li hember rexneyên Amerîkaniyan û Ewropîyan; desthilatdariya AKP jî, polîtîka, „kevrosk bireve! taji bigre!“ didomîne.

Îranê, 4 Kurd li sêdarê dan û bi dehan jî zîndanî kirin!

PK - Rêxistina Mafên Mirovan ya Kurdistanê (RMMK) di du daxuyaniyên cuda de, navên bi dehan zîndanîyên siyasî yên Kurd ku di zîndanên Urmiye û Sine de ne, belavkirin û bangî tevayê komele û navendên parêzerên mafên mirovan yên li Îranê û hemû cihanê kir ku li beramber rewşa xirab ya zîndanîyên Kurd bédeng nemînin û jibo azadiya wan bixebitin. Rêxistina Mafên Mirovan di belavokên xwe de

diyar kiriye ku „Dadgeha Îngilabî ya Îslamî“ li Îranê cezayê sêdaredanê jibo bi dehan siyasîyên Kurd derxistibû, û ev hukim li ser 13 jî wan siyasîyan rakir û kir zîndanîkirina heta hetayê û 18 kesên din jî bi 271 salan hatin hukim kirin.

Her wiha 4 kesên din jî li sêdarê dan. Gelek jî van zîndanîyan ev nêzîkî 10-15 salane di zîndanên de ne.

Dadgeha Îngilabî ya Îslamî van

kesên siyasî bi alîkarî û tîkîliyê li-gel Partiya Demokrata Kurdistan-Îran û Komeleyê tawanbar kirine û hinek jî wek sîxurên dewleta Îraqê bi nav kirin e.

Li gora daxuyaniya (RMMK) ev kesên siyasî jî aliyê dadgehê ve hatine hukim kirin ku tu merc û prensîpên navnetewî tê de tune ne û mafê girtiyan yê hebûna parêzeran û dadgeheke eşkere û dadperwerane jî nehatiye bicînanîn.



biravetî

Bayram Ayaz

Yekîtiya Ewropa dê bi Tirkîyê re dest bi guftûgoyên encam nediyar bike!

Roja 3ê çarşemê 2005 jibo Tirkîyê û bakurê Kurdistanê rojek girîng e. Yekîtiya Ewropa dê biryarê bide, gelo bi Tirkîyê re dest bi muzakereyan jibo endametiye bike an na?

Ev biryar pirsê stratejîk e. Bêguman ne tenê jibo peywendiyên nabeyna YE û Tirkîyê. Ev biryar wê bandora xwe heman demê liser peywendiyên „Orient“ û „Okzident“, yanî „rojhilat“ û „rojawa“ jî hebê. Aliyêke wê pirsê bi peywendiyên nabeyna ol û kulturen jî heye. Jiber ku rojavayî Tirkîyê, wek pîrekê di nabeyna cihana îslam û dinya meslîhê de dinirxînin.

Di warê aborî de jî hêviyên wan heye. Ewropî dixwazin Tirkîyê jibo sermîyandariya navnetewî bibe pîrekê ber bi Rojhilata navîn, Kafkasya û Asya navîn ve.

Di warê bir û hizir û emîn û aramiyê de jî Ewropî dixwazin ku fanatîzm û terora olperestiyê ya li pişt perdeya ola îslamê tê meşandin, bila li Anatoliyê asê bibe û nikaribe jî wê derê derbazî Ewropa bibe. Ligor wan pêwîste Tirkîyê hewl bide, pêsiya îslama siyasi ya fanatîk bigire.

Dema ku çarçove û pîvan ev bin, jibo gelek dewlet û hêzan ew qasî ne girîng e, gelo dewleta Tirkîyê kriterên Kopenhagenê bi temami cibeçîh kirîye an na?

Tiştên li Tirkîyê jibo endametiya YE hatine kirin li holê ne. Belê rast e, Tirkîyê di mevzuata xwe ya yasayî de hinek guhertin çêkirin. Navê wan danîne „Reform paketlerî“. Lê ev guhertin tîra demokrasîyêke rasteqîn nakin. Mixabin ev guhertinên yasayî di nav praksîsê de jixwe qet bicîh nekirine, liser karîzê mane. Di zihniyeta Tirkîyê de jî kêr guhertin peyda bûye. Bilakis tevgerên sovenîst nîjadperest xurtir bûne. Dewleta kurr van hêzan bi taybetî li dijî tevgera Kurdistanî xurt dîke.

Wekî Ewropî jî di raporên xwe de diyarkirine, li Tirkîyê astengiya herî girîng li pêsiya demokrasîyê û pêxistina civakeke sîvil otorîteya generalan û siyaseta kemalîst e. Îro ne kontrola ordiya Tirkîyê kêr bûye, ne jî dewlet dev jî kemalîzmê berdide. Oligarşiya kemalîst ku hêza wê esasî general in, dixwazin xwe li ser YE û Amerîkayê ferz bikin. Eger rojavayî sistema Tirkîyê bi vî halî bipejirînin, general amade ne ku li dijî fanatîzma olî jî rojava re zêrevanî û qewrasîyê bikin. Lê derdê generalên Tirkîyê pîrsa Kurdistanê ye.

YE hê ne amadeye, Tirkîyê bike endam. Sedemên herî girîng aborî û balansên navxweyî yên YE bixwe ne. Tirkîyê hê di warê aborî de ne di wê sewiyê de ye ku bikare bêkar û betalên xwe ter bike û bûdçeya wê hê di bin deyna de ye û di serde jî kriminalîte û gelek tiştên di heye. Pîrsa Qibrîsê, doza Kurd, problema Ermenîyan û gelek mijarên di... Ewropî naxwazin van pîrsa bixin pêsiya xwe!

Stratejiya Ewropîyan em dikarin wisa binavbikin. Tirkîyê jî destê xwe bernedîn, lê wê nexin nav xwe jî û hinekî jî dûrve lê kar bikin ku sistem xwe biguherîne, demokratîze bibe. Jibo wê yekê dê muzakere dest pê bikin, lê dema van guftûgoyan û encamên wan ê ne diyar be, bi salan bikêşe. Ev siyaset û stratejî jî fêdeya Kurdan e. Helbet bi şertê ku tevgera Kurd û Kurdistanî stratejiyêke xwe ya netewî hevbeş hebe û bikare daxwazên xwe cibeçîh bike. Îro tevgera Kurd mixabin ne di wê hêz û mecalî de ye.

Kurdên Tirkîyeyî (yanî apoyî) doza wan a welat, dewlet, desthilat û alê nîne. Daxwaz û nêrinên wan di Konferansa ve dawiyê de li Brukselê careka di diyar bû. Hêzên di jî siyaseta û xebateka wan a hevbeş tune. Kêmasiya herî mezin jî ya van hêzan e. YE biryara xwe zelal kirîye, vêca emê lê an 3ê mehê hê nû herin Brukselê li pêş xênîyên Komîsyonan qireqîr bikin. Ev ne siyaseta! Naxwazim kesî gunehkar bikim, ev eyb û şasiya me gîşa ye.

Tirkîyê jî Krîterên „Anqerê“ nehat xwarê, lê...

Di 3ê mehê de Yekîtiya Ewropa (YE) wê biryarê bide ka ewê jibo endametiye bi Tirkîyê re dest bi muzakereyan bike an na.

Komîteya temsîlkarên daîmî ya YE yê (COREPER) di vî mijarê de wê heta 29-30ê mehê „Belgeya çarçoveya muzakereyan“ amade bike û jibo pejirandinê pêşkêşî Konseya YE bike.

Piştî ku belge jî aliye Tirkîyê ve jî hat pejirandin, wezîrên derve yên YE wê di 3ê mehê de li Luksembûrgê bicivin û belgeyê bê ku guherandinekê tê de bikin erê bikin. Wezîrên YE piştî erêkirina belgeyê wê bi Wezîrê Derve yê Tirkîyê Abdullah Gül re bicivin. Bi axaftina Gül û Serokê YE Wezîrê Derve yê Brîtanîya Jack Straw muzakere wê bi awayekî fermî dest pê bikin.

Eger di vî belgeyê de „şirkatiya bi îmtiyaz“ nehatibe pêşniyarkirin, wê Tirkîyê belgeyê qebûl bike û jibo destpêkirina muzakereyan di 3ê mehê de beşdarî civîna li Luksembûrgê bibe.

Di mijara pîrsgerîka Qibrîsê, (Tirkîyê dewleta Qibrîsê ku di sala 2005an de bû endamê YE

yê nasnake) Kurdistanê û Ermenîyan de Tirkîyê jî çareseriyê direve û hêvî dîke ku bi krîterên „Anqerê“ di nav welatên ku krîterên „Kopenhagen“ê qebûl kirine de jî xwe re cîhekî bibîne. Jiber sebebên cûrbecûr pîraniya welatên Ewropî jibo destpêkirina muzakereyan van pîrsan asteng nabînin. Ev welat guman dikin ku bi pêvajoya muzakereyan, van pîrsan niqaş bikin û di çarçoveyê de bi dilê xwe de çareser bikin.

Lê Awûstûrya îsrar dîke ku muzakereyên bi Tirkîyê re bi formulasyoneke dervî endametiye bi dawî bibin. Li gora rojnameya Financial Times, wê Yekîtiya Ewropa ligel muxalefeta Awûstûryayê jî bi Tirkîyê re dest bi muzakereyan bike. Nivîskarê gotarê Daniel Dombey wiha berdewam dîke: „Endametiya Tirkîyê ligel raya giştî ya YE daxwaz û heyecanekê çênake. Berevajî heyecanê, ew li beramberî muxafeleteke dijwar e. Di vî mehê de lêpîrsînekê eşkere kir ku nîsbeta piştigiriya endametiya Tirkîyê dîke, li Fransa jî sedî 11, li Almanya jî sedî 15 û li Brîtanîya jî sedî 32 ye.“

Gotûbêjên li ser Tirkîyê berdewam in

Di dîroka YE de heta niha li ser endametiya tu welatî bi qasî ya Tirkîyê niqaş nebû û serêşî derneket. Di Parlamentoya Ewropa (PE) de Grûba Xirîstîyan-demokratîyan ya herî mezine û bi dijwarî li dijî endametiya Tirkîyê disekine. Di civîna PE ya 28ê mehê de Serokê Grûba Xirîstîyan-demokratîyan Hans-Gert Poettering di axaftina xwe de weha got: „Li Tirkîyê bisinorkirina azadiyên olî û ramanî dom dîke û eşkence nehatiye astengkirin.“

Grûbên Sosyalişt û Keskan piştigiriya endametiya Tirkîyê dikin.

Di 3ê mehê de wê tenê biryara jibo endametiye destpêkirina muzakereyan bê dayîn. Agahdariyên diyarkirî hemû eşkere dikin ku YE wê bi Tirkîyê re dest bi muzakereyan bike.

Lê.. Bi vî biryarê hertişt naqede. Heta tu tiştê naqede.

Hertişt wê jî nû ve û jî serî ve dest pê bike.. Eger Tirkîyê jibo endametiya YE durust be û jî xwe re leystika naleyize rêya wê dîr û dirêj e.

Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî: Em wek miletekî şanaziyê bi dîrok, ferheng û zimanê xwe dikin

Mesûd Barzanî „Bi navê Xwedayê mezin û dilovan“ bixêrhatina beşdarî kir û got, „Hûn bi xêr hatin, li ser seran ser çavan, min hez dikir ku ez doh 22/9 beşdarî festivalê bibim. Lê belê bernameki pêştir jî bo me hatibû danîn û em di nav da man, ji ber vî yekê îro ez hatim xizmeta we, bi xweşhalî ev derfet jî bo me hate pêş da ez pişikdariyê di vî festivalê de bikim“.

Barzanî di axaftina xwe de gotin anî ser ferheng û çanda Kurdî û da zanîn ku, em wek miletekî, şanaziyê bi mêjû ferheng û zimanê xwe dikin, çûnkî em xwedanên gelek zana, feylesof û hozanvane ne. Serokê Kurdistanê navên weke Melayê Cizîrî, Xanî, Muksî, Mewlewî, Nalî, Wefayî, Hejar û Cegerxwîn bilêv kirin û wiha berdewam kir, „Yek jî bingehên bûna netewebûnê ziman e. Ji ber vî yekê, di destûra hemîşeyî ya Îraqê û di Yasaya Kafî ya Dewleta Îraqê ya berî destûrê de, me israreke zor li ser wê xalê kir ku lazîme zimanê Kurdî û zimanê Erebi herdu weke hev zimanê resmî bin. Em li Îraqê du millet in, em wek hev şîrk in, çawa emê vî

şîrkatiyê nîşan bidin? Yek jî wan îşaretan ew bû ku zimanê Kurdî zimanê resmî be“.

Barzanî, kombûna rewşenbîran weke pêngaveke pîr giranbuha nîrxand û da zanîn ku ew hêvîdar e, çameke serkeftî jê derkeve. Di berdewamiya axaftina xwe de Serokê Kurdistanê da zanîn ku, dijminê gelê Kurdistanê ne tenê bi tank û top û firokan şerê Kurdan kirine, lê wan şerê ziman û ferhenga Kurdî jî kirine. Mesûd Barzanî di derbarê zimanê Kurdî de wiha berdewam kir, „Ew şanazî ye jî bo miletekî weke me ku hewqas zilm û zordarî lê hatiye kirin, lê zimanê xwe û pênasa xwe ya netewî parastî ye“.

Barzanî di xîtaba xwe de, temamê rewşenbîrên ku jî herçar hawîrên Kurdistanê û Ewropa hatibûn, weke, „Xwişk û birayên berkeftî“ binavkirin û sedema vî yekê wiha anî ziman, „ez jî were nabêjim mêvanên birêz, çûnkî hûn ne mêvan in, hûn li mala xwe ne, hûn li welatê xwe ne“.

Barzanî di axaftina xwe de li dîroka Kurdistanê vegeriya û wiha got, „Di dîrokê de, wek neteweyekî, zilmeke zor li me hatiye ki-

rin, bi taybetî piştî cenga cihanê ya yekem pîr guhertin li cihanê çêbûn. Em yek jî wan mileta ne ku jî me nehat pîrsîn û negotin we çî divê. We divê welatê we hebe û hûn serbixwe bin? Yan we divê ligel Ereban, ligel Tirkîyan, yan Farîsan bijîn? Rastiyeke li ser me hat ferzkirin. Bêguman eger raya neteweya Kurd hatiba wergirtin, miletê Kurd jî wek her miletên di yê daxwaza serxwebûnê bikira, çûnkî mafekî siruştî yê vî miletî ye. Lê hema ev dabêşkirina me li ser çend welatên di, راستiyêke tal durust kirîye. Pîr hewldan dihatin kirin ku me nehêlin, lê siyaseta nehêlana neteweyekî siyaseteke çewt e“.

Mesûd Barzanî di axaftina xwe de da zanîn ku, eger demên rast û durust bîn hilbijartin, emê jî wek her neteweyekî di bighên mafên xwe, bighên mafê çarenûsa xwe, emê jî bibin xwedî welat, xwedî dewlet, em xwe jî Ereban, Tirkîyan û Farîsan kêmtir nabînin û wiha berdewam kir, „Xaleke di ku li cem min zor girîng e, eve. Em wekî Kurd pêwîste wî dîwarê tirsê yê derûnî bavêjin, Kurd naxwazin jî îro û pêve bitirsin ku bibêjin “ez Kurd im“.

ZIMAN Û WÊJEYA GELEKÎ ŞERÊ HERÎ MEZINE

Soran Mîro Boka

Piraniya welatan ne tenê bi zora şûr û mertalan avabûne. Dema ku meriv bala xwe dide dîroka gelên welatên mezin, rol û giranbîhatiya zimanan xwe di hundurê jiyana gelekî de di çand û wêje de nîşan dide.

Nivîskarê Îtalî Petrarca û Dante, yê Brîtanî Shakespeare, yê Almanî Goethe, Henry James û Edward li Amerîka di şerê navbera bakur û başûr de di eniya şer de wek şervanên pênûsê şerkirine. Her dilopek xwîna ku ji bo avabûna welatekî serbixwe li ser erdê hatiye rijandin, wan helbestvanan wek bêje berhevkirine û di ruh û canê gelê xwe de wek çawa darek li ser erdê şîn dibe û koka xwe davêje kûriya bin erdê, bi awayekî welatperwerî di wêjeya xwe de hûnandine.

Ew wêjeya wan wek baxçeyekî gulên ku gul ji gulmitê (stîrî) nayê veqetandin di ruhê gelê xwe de nîrxandine.

Em dev ji şerê navbera Kurdan û dijminê Kurdan berdîn, bi salan tevgera Kurdî ji hevdû mirov kuştine, heta roja îro jî tiştek li ser wan bûyerên bêyom û bextreş nehatiye nivîsandin. Em Kurd fêrbûne hema çî şaşîfî di jiyana me Kurdan de pêk tê, em bixin hûstiyê dijmin. Lê tu carî em di neynîkê de li sûretê xwe mîze nakin.

Tu Rûs û Amerîkî nayên ji bo me şano nanivîsin, ew ancax dikarin me ji hinek dijminan xelasbikin û ji wir pê ve gerek em xwe bi xwe rast bikin.

Goethe yê Alman ji 70 hezar bêjeyên zimanê Almanî, bi kêmasî 30 hezar xistiye hundurê berhemên xwe yê nemir. Yanî di berhemên xwe de hema hema nê-



EHMEDE XANI
Mem û Zîn

viyê bêjeyên zimanê Almanî bikar aniyê.

Hejmara mirovê ku navê Ş. De Gaulle li cihanê bihistiye belkî bi pêçiyên were hejmartin, yanî pir kêman in. Lê navê J.P.Sartre, dev ji gelên cihanê yê ku ji her alî ve pêşde çûyî berdîn, li Kurdistanê li gundekî ku Xwedê jî riya xwe pê nexistiye hatiye bihistin. Ji ber ku di riya Sartre re çand û wêjeya Fransiyayê bandora xwe li ser gelên cihanê kiriye.

Ev mînak jî nîşan didin ku rola ziman, rêziman û serwestbûnê di hundurê çand û wêjeya gelan de çiqasî girîng û giranbuhaye.

Lê wexta ku em dîroka xwe hema ji her alî ve bi dîroka wan welatan re beramberî hevdû dikin, zimanê Kurdî bi çîrok, helbest, serpêhatî, destan, folklor, şano, yanî bi kurtî wêjeya Kurdî ji me jûyekî Kurdî û welatperwerî nehatiye hûnandin.

Ji ber ku meleyên me Kurdan ji Kurdayetiyê zêdetir li ser olê rawestiyane li ser doza welatperweriyê û serfiraziyê ji nîfşên pêşiya xwe re nebûne stûna netewetiyê. Farisan, Ereban û Tirkan ji xeynî olê her tiştek ji bo Kurdan qedexe

kirine. Wan camêran hesabê xwe pir baş kirine.

Ola herî mezin di 200 salên dawî de di dîroka cihanê de bûyina neteweyekê ye.


Roja îro mînakê herî balkêş Rêxistina Netewên Yekbûyî (RNY) ye. Ger li konferanseke NY li New Yorkê netewe li cem hevdû rûniştin, tu ol li wir wê neyê temsîl kirin, yanî tu kes bi navê elewîtiyê, sunîtiyê, yezîdîtiyê, mesîhîtiyê, cihûtiyê an bîr û baweriyek din li wir nikare amade be. Her mirovek bi netewa xwe dikare li wir amade be û bi navê netewa xwe bipeyive.

Li NY tu bîr û baweriyên olî temsîl nabin. Li wir tu kursî ji bo olan nehatine danîn. Em Kurd gereke serê xwe ji binê axê derxin, li riya çûyîna netewên cihanê bînerin. Meriv li tu ciyan bi ola xwe nayê pirsîn û temsîl kirin, netewe berî her tiştekî ye.

Montesque di peyvek xwe de dibêje: "Gereke em wan reşikan (Afrîkiyan) wek seg nebînin, bi wan re pêwendiyên segî nekin, lê wexta ku em wan di sewiya xwe de bibînin, em ne mesîhiyên baş in."

Wexta em Kurd jî iddîa dikin ku em ji gelên cihanê hemûyan zêdetir ji Xwedê û ji olên wî hez dikin, gereke em ji ziman, netewe û welatê ku Xwedê diyarî me kirî jî hezbikin û bi ruh û canê xwe biparêzin, ne ji netewa xwe ne ji zimanê xwe şerm bikin.

Demê ku em ji van diyariyên ku Xwedê daye me fedî bikin û hebûna xwe veşêrin û em ji xwe re bêjin ku em Ereban in, Tirk in, Faris in wê wextê em ne olparêzên baş in. Ji ber ku em li wê diyariya ku Xwedê diyarî me kiriye xwedîtiyê nakin...



Kadîm Kan

MONIKA

Şemîya çûyî firma ku ez lê kar dikim bi minasebeta 40 saliya xwe ziyafetek da, ez ji li wir bûm. Di nav mêvanan de çavên min çend cara bi jineke navsere ket. Pîreke xwe wek zarokeke ne rehet diqil-kilandin. Du xortê ku pêra bûn wek bi xwişka xwe ya mezin re bipeyivin, hedi û bi nermayî li dora wê diçûn û dihatin.

Her cara min çavê xwe jê dûr dixistin, wek hinek ji min re bêjin "de ka careke din ji lê mîzeke, ka wê evê care çî bike"

Hevalê min yê kar li min mîze kir û got: "Ew pîreka ku wiha bala te dikşine, du caran ji diya xwe bûye. Berê pîrekeke ku cîranên wê hevza xwe jê dikirin, mîrê wê ji destê wê hatibû el emanê. Niha jî di gewdê pîrekeke 54 salî de, keçikeke 16-17 salî ye. Bûye xwediyê "eze" kî, nasnamekî din". Min bawer nekir û ez bişîrtim. Dostê min got: "Ez wan nasdikim, were em herin cem wan". Em bi hevdû dan naskirin. Navê pîreke Monîka bû.

Monîka berî 6 salan şevêke radizê, wexta sibehê şiyar dibe tu tiştek nayê bîra wê. Her tişt, lê belê her tişt ji bîra wê çûye, hafîza wê, wek Hard diska datakî ku tu vala bikî, vingî vala dibe.

Navê nexweşiya wê (porfyri) ye. Nexweşiyêke ku ji kezêbê dest pê dibe û xwîna dilewitîne.

-Min nîzanîbû ez kî me, min navê xwe nîzanî bû. Keça min (wî çaxî) 9 salî, bûbû xwişka mezin ez bûbûm xwişka biçûk. Min nîzanî bû cil û bergê xwe lixwe kim. Eger kesî xwarin neda min, min nîzanîbû ku meriv kare here ji sarincê xwarinê ji bona xwe derxe û bixwe.

Çekirina xwarinê? Qet behsa wê neke. Ez niha jî hinek xwarin çêdikim û di peyde davêjim. Bi kenokî got; ji ber ku nayê xwarin. Tu tiştek ji karê navmalê nedihatîna bîra min. Min bi wê mesûliyetê jî nîzanî bû.

Min tiştek tenê dixwest. Ez ji xwe re bilîzim. Stranên ku diya min ji bona min di zarokiya minde gotibûn hemî dihatin bîra min û min her stranê zarokan digotin. Tu hîsekî min li himber zarok û mîrê min tine bû. Ez ji wana jî weke ji xeriban ditirsîyam. Serê xwe kir berxwe û bi nermî berdeyam kir; lixwe negre ji bona ku tu jî xerîbî.

-Ma te zanî bû ku tu mezinî û zarokiya dikî arî te xwe zarok didî? Te qet li aynê mîze dikir? Baş û xirab, germ û sar. Te çawa ji hevdû dikirin?

-Min xwe zarok didî. Min nîzanî bû xirabî çî ye, herkes baş bû. Di peyda min başî û xirabî ji hevdû kir. Pir kêfa min ji mîzekirina aynê û şêkirina por re dibat.

Keça min ez fêrî tiştan dikirim, yanî ez ji keça xwe biçûktir bûm. Ez ji temenê keçikeke 6-7 salî, di nava 6 salan de, bûm jineke 54 salî, diya zarokan. Jina mîrekî ku zarokên me 15-20 û 24 salî ne lê ez wan ji 6 salan ve nasdikim. Pir zore, ya herî zor "ez hebûm lê ez tine bûm. Ez hema lê jî 6 salan û vir de ez hema."

Çavên wê tîjî bûn rabû çû da ku dest û ruyê xwe bişo. Kurê wê yê biçûk ji pê re çû.

Ez ecêbmayî ma bûm min ji kûrê wê yê mezin pirsî; kê alikariya we kir, we çawa, ew ji 6-7 saliyê, anî 54 saliyê?

-Me gelek zehmetî dît û hin jî zehmetiyên me hene. Lê wê hinek tişt jibîr nekiribûn û wan tiştana gelekî alikariya me û doktoran kir.

-Ew tişt çibûn?

-Zimanê Swedî, stranên pîra min û baweriyaya bi Xuda. Meriv kare nexweşiya Monîka hem wek dua hem wek nîfir ji xuda bixwaze.

Eger hûn ji bona hinek siyasetmedarên me bi çî awayî bixwazin, ez dibêim.

Amin...

KOMKARÊ dev ji Tirkî berda

PK - 19. Kongreya Yekîtiya Komeleyên Kurdistanê KOMKAR di 24-25ê Îlonê de, li Almanya bajarê Duisburgê pêk hat. Kongreya KOMKARê piştî hilbijartina dîwanê, bi axaftina serokê Şaredariya Duisburgê vebû û bi axaftina serokê KOMKARê Fettah Tîmar berdeyam kir. Tîmar di axaftina xwe de diyar kir ku wan kongreya xwe spartiyê bîranîna du pêşengên Kurd û wiha berdeyam kir, "bi sedema 80 saliya dardakirina Şêx Seîd

û hevalên wî û ji ber 100 saliya jidayikbûna Osman Sebrî me kongreya xwe spartiyê bîranîna van herdu nemiran". Di kongreyê de nûnerên piraniya partî û rêxistinên Kurdîstani amade bûn û wan peyamên xwe pêşkêşî beşdaran kirin. Serokê HAK-PARê A. Melîk Firat û serokê berê yê PSK Kemal Burkay jî peyamên pîrozbahiyê şandin kongreyê.

Hejayê gotinê ye ku di 19. kongreya Komkarê de tenê bi Kurdî hat axaftin.

KOMKAR di 3yê Cotmehê de li Brukselê ye

Yekîtiya Komelên Kurdistanê KOMKAR xwe ji bo xwenîşandaneke amade dîke ku wê di 3yê Cotmehê de li Brukselê bê lidarxistin.

KOMKAR xwe amadeyî xwenîşandaneke dîke ku wê di 3yê Cotmehê de li Brukselê bê lidarxistin. Li ser vê xwenîşandaneke KOMKARê bangê derxistiye û gazi dîke ku hemû Kurd bîr beşdarî xwenîşandaneke bibin.

Wek tê zanîn, di 3yê Cotmehê de wê li bajarê Brukselê ji bo peşkirandina endametiya Tirkîyê gotûbêjek dijwar dest pê bike. KOMKAR dixwaze bi vê xwenîşandaneke bala

endamên YE bikşîne ser pîr-girêka Kurd li Tirkîyê.

Dema xwenîşandaneke: 03.10.2005, saet 13.00-16.00

Cih:

Navnîşana berê: Van Maerlandplein 1040 Brussel

Navnîşana nû: Place Jean Rey, 1040 Brussel

Têbînî:

Di xwenîşandaneke tenê bi ala Kurdistanê tê meşandin. Kes û rêxistinên ku tenê ve xwenîşandaneke bila ve biryarê bizanbin.

Helîm Yûsiv:

Ez nenivîsînîm, ezê mirar herim


Peyama Kurd: Kenê tal ku şeweyeke rojane ye, şeweyê mirovên "biçûk" e wekî ku desthilatdar me bi nav dikin, ev mirovên di çirokên te de, bizava jiyane bi rêve dibin, gelo xeyalekî te ne, an bi rastî li Amûdê û li tevaya binxetê, ev kes hene?

Helîm Yûsiv: Kesên mîna kesên di çirokên min de li her deverê tene dîtin. Ev kes jî ji çirokekê ta bi çirokekê tene guhertin. Carna karakterên wan jî karakterên hevalin min tene girtin. Carna jî sîmayên çar pênc kesan, di çirokê de, tenê yek kes tê holê. Carna jî ez bi xwe me. Lê ji kesan bêtir ji boyî min tecrube girînge. Kesên çirokê her çiqasî jî xeyalê bêne afirandin, lê dîsa jî bîngeh ev jiyana rojane ye, ya ku temenê mirov didize û mîna cilikê, ji bin piyê mirov tê kişandin. Tenê mirin mirov vediciniqîne. Xeyal çiqasî dûr û bilind here jî, dîsa lingên wê li erdê tene dîtin. Weke mînak, xewn çiqasî tevliheve û para xeyalê çiqasî tede mezine, dîsa jî ji detayên jiyana rasteqîne pêk tê. Dibe ku di xewnê de, gelek tiştên dûtî hev bêne cem hev, sax û mirî bêne cem hev, lê dîsa jî tecrube ya te bi wan saxan re, bi wan miriyan re heye. Di hişmendiya te de gihiştine hev, çirok jî carna weha mîna xewnê ava dibe. Hişmendiya te wan bermayiyên şewata te û agirê ku dilê te niha di nav de dijî, tîne cem hev û çirokekê nû tê holê. Cudayiyê girînge heye, ew jî eve, ku xewn bê mentiq, bê rêbaz tene hûnandin, lê çirok bi rêbazên hunerî tene hûnandin. Çiroka bê mentiqê hunerî, termê heywanekî ye.

Berdewamiya pîrsê jî ev e: çima ev kes lehengên Helîm Yûsiv in, çima ne ew kesên gazinokî û giriyokî ne, ken li dijî taliya jiyane dikare çî bike? Gelo şeweyekî, hedan û benckirina êşê ye, an çekê befxwedana mirovên "biçûk" li dijî dagirkirina kesên "mezin" jî xewnên wan re ye?

Pir hesane ku tu kurdan bigirî, lê ya zehmet ewe ku tu van kurdên ku ken jibîrkirine bide kenandin. Ez, li vêderê, ne li ser tiqîqê û wî kenê asayî dibêjim, na, mebesta min kenê reşe. Ew kenê ku li ser bîngeha tîgehên felsefî û ji dil, derdikeve. Pêwîstiya kurdan jî, ji her tiştî bêtir bi ken heye. Ken alaveke berxwedanê ye. Li hember vî qiriktalî û feqîrî û perîşaniya ku Kurd tê de dijî, ken, bi taybetî li nik kurdan, dikeve rengê jiyane. Bi kurtayî be jî mirov

„Koçberiya her mirovî ji reşiya malzarokê destpêdike û bi reşayiya gorê bidawî dibe. Jiyan bi xwe koçberiyê dijwara di navbera herdû reşayiyan de”.



dikare qala wêjeya devkî bike. Bala xwe bide gotin û melodiyên stranên kurdan yê kevin. Melodiyên wan heta radeyê mezin nêzîkî girîne. Dengbêj gava ku destê xwe datîne ser guhê xwe û dibêje, dengê mîna dengê girî, derdikeve. Weha jî em li ser bi sedan stranên şîniyê û hewar hewarê mezin bûne. Li hêla din jî, dengê wêjeya kurdî ya nivîsandinê de, ne roleke serekeye. Tev ku bandora çî li ser gelek nivîskaran bandoreke bîngehîne û bi guhertina çî re şewê û naveroka nivîsên wan tîne guhertin, lê nivîsandin jî bo min encama şewateke hundirîne. Ew şewat bi min re cih bi cih digere. Ev nayê wê wateyê ku çî, heta dawî, bê bandore. Derbasbûna cihêkî nedîtî û jiyana tede mîna derbasbûna çirokekê evîne ye. Her cihêkî nû, jîneke nû ye. Weha jî mijareke nû ye ji bo afirandinê. Du aliyên guhertina çî hene, yek neyênî ye.

Te jiyana weha buhurandiyê zarokî û destpêka ciwanîyê

Dema ku mirov ji cihê xwe yê yekem qut dibe, mîna mirov ji kaniya mijaran qut bibe. Germayiya tîkiliyê namîne û cihê nû dibe kelem di riya berhemên nû de. Nivîskar him jî çavkaniya nivîsên xwe qut dibe û him jî nikare çavkaniyê nû bibîne. Aliyê erênî jî ewe, ku mirov bi keşîkirina cihêkî nû re dikare bibe xwedî agahî û tecrube yê nû. Weha jî materyalên nivîsandinê tene guhertin û dewlemendtir dibin. Her cihê ku ez lê jiyame siya xwe avêtiye ser hinek nivîsên min. Ji Amûdê bigre hetanî bi Helebê û hetanî Elmanyayê. Ez girîngiyê mezin didim tecrube ya kesayetî, ya şexsî, di nivîsandinê de. Ji ber vê jî cihê ku ez lê bijîm, erda ku ez li ser bigrîm, ezmanê ku ez li bin bîkenim wê bibin mijarên nivîsên min. Hinek nivîskarên Kurd hene, sîh salî li Ewropayê dijî û dîsa jî tenê karin li ser gundê xwe li welêt binivîsin. Ev kêmaniyê mezin ye wêjeya kurdî li derveyî welêt.

Dîsa jî di vî pêvajoya kor ya felekê de, Helîm Yûsiv xwe di çavên mirovên dora xwe de çawa dibîne, ji Amûdê a Zergayê û bavê Mihemed, ta Heleba rewsenbîrên Ereban, ta Berlîna çavên xwîn sar. Helîm çiqasî bi xuya bazdana li dî jiyane hatiye guvaştin û strandin û ev dîmen: Helîm çiqasî dinav rêzên çirokê te de veşartiyê an jî diyare?

Jiyana min bi gelek aliyên xwe yê girîng ve, ji jiyana her kurdî ne dîre. Eger bi dîmeneke giştî ez meselê ragihînim. Lê, di vî derbarê de, mirov neçare ku qala hinek taybetiyan bike. Dema hevîrê rihê te di teştê nivîsandinê de, bê stirandin, bê guman, wê ne derbasbûna te ya tecrube weke xeynî te be, ne jî derketina te ya ji tecrube weke ya kesekî din be. Ez hinekî zû bi xwe hisiyam ku êdî jiyana nivîsandin, ji bo min, du peyven çuda ne, lê bi yek wateyê ne. Ango, ez nenivîsînîm, ezê mirar herim. Eger rojekê te bihist ku ez nema dinivîsînîm, nasbike ku dilê min rawestiyaye û ez ne li jiyane me. Jiyan jî, ji bo min ew ew çend rêzên ku min nivîsandinê de. Çawa oksîjen ji bo jiyane girînge, weha jî, ji boyî min, nivîsandin, di vî çarçovê de, tîkiliya di navbera jiyana û nivîsandinê de tê durîstkirin. Girêdayî vî xalê jî, perçak ji giyanê min di bin çermê her çirokekê jî çirokên min de veşartiyê. Carna dikarim xwe di kirasên kesên çirokên xwe de veşêrim, carna jî hefsarê êşê jî destê min difilte

û ez û kesên çirokên xwe dibin yek giyan, yek ziman û yek figûr. Nivîsandin encameke yeksere jî encamên êşê, êş jî giyan dertê, giyan jî bi peyvan re dibe yek, dibe çirok.


Di hevpeyvînekê bi Mano Xelîl re, ew dibêje, zanîna zîmanê erebî di hundirê min de mirovekî dike! Tu çî dibêjî, nexasîm te bi erebî jî nivîsandinê! Gelo tu poşmanî? An jî gengazê rojek were ku tu poşman bibî liser van nivîsandinan, liser zanîna xwe jî erebî re, liser çanda erebî ku dibin çermê me de genî bûye?

Ez wekî Mano Xelîl nafikirim. Materyalên Mano ji bo filmçêkirinê tiştine din in û yê me, peyvî. Zanîna her zîmanekî ji bo min kilitê nû ye di dest de, mirovekî nû ye, çandeke nû ye. Heta radeyêkê ez wan hestên Mano qala wan dike fêm dikim, ji ber ku tiştêkî xwezayî dema ku helwestên kurdekî li hember erebî, farisî an tirkî bêne stendin. Desthilatdarên Ereba, Tirk û Faris bi salane ku zîmanê me qedexekirine. Bersiva herî durîst, li dijî wê qedexekirinê, di nerîna min de ewe ku Kurd karibin baş bi wan her sê zîmanan binivîsin, lê berî hersiyar jî zîmanê Dê. Ji bo Kurd ber bi serxwebûn û azadiyê de biçin, pêwîste ku pêwîstiyên girîng yê kurdan di qada her zîmanî de hebin. Mebesta min ew pêwîstiyên xwedî nasname ne ku karibin rastiya kurdan bi xwendevanên wan zîmanan bidin pejiwandin, ne ku di nav wan zîmanan de bihilin û taybetiya xwe wîndabikin. Ez ne poşmanîm ku min bi erebî nivîsandinê û hîna jî, li gor derfetên xwe, dinivîsînîm. Ezê poşman nebim jî, berevajî wê, xwezî min bi gelek zîmanên din jî zanibûya, da ku min hinek din ji vî êşa giran, ji vî êşa kor ya ku em di nav de, bi belengazî, digevizin, ji bo her kesî ragihandibûya, xwezî min bi zîmanê teyr û tilûran jî zanibûya, ji ber ku hemû zîman tîra vî êş û qiriktaliya me ya bê sinor nakin.

Di Cezîra binxetê de di serdema me de, çandeke çep gurr bibû, di hundirê vî çandê de pencereyêke cihannas û mirovane ji me re vebibû, hem jî serpehatiyên zor xerab jî, yê xerab ew in, ku di çepên ereban de çandek roj bi roj êşkere dibe, ew jî çanda faşîzma çep, û faşîzma mafên mirovane, ango sembolen çep û mafên mirovan "qaşo" amade ne jîbo sitembarên ereban bêne kuştin, lê di eynî demê de jî amade ne Kurd û Kurdistanê bi darkekî

kiftikê bişewitînin, ev çand berî Sûrî li Tirkî û Îraqê heye, mixabin heta li vî welatî jî ne zêde veşarti ye, li hemberî vê zikreşiyê, çavnebarbûnê, vê faşizma ku xwedî taybetiyeke cihanîye li hemberî kurdan, "mirovê" di hundirê me de heta çiqasî dikare debar bike û bi hevî be ku di cihanê de hêj xêrxwaz hene?

Di baweriya min de cihan li ser hêzê ava bû ye. Pirsra mafan jî, yekser girêdayî hêzê ye. Li daristanan çawa bihêztirîn lawir (heywan) serdeste, weha jî li vî dunya ya me. Du hezar sal têra mirovayetiye nekirin ku asta heywanîtiyê derbas bike. Hemû felsefê û teoriyên ku mirovayetiye li pey xwe hiştine jî, hewildan in (Sêzêfî), ji bo bilindkirina kevîrê dadmendiyê ber bi serê çiyê ve. Felsefeyek li pey ya din têk çû û jiyan her weke xwe meşiya heta roja îro. Xuyaye ku ew dîtinên teorîk ku te weke (çand) nav lê kiriye, kirasin fireh bûn ji bedena mirovan re, mebesta min ew mirovên di asta herî bilind de ne. Teoriya çepîtiyê jî di vî çarçoveyê de, kete rewşeke komedî. Ez dixwazim mînakê çepên Erebbidim. Nizanim em bi awayekî komedî vê yekê binirxînin yan bi awayekî tirajedîk. Komonîstên Sûryê bi şev û roj piştgiyariya xwe ji bo Kûba, Nikaragûa, Filistin, Laos û Cezîra Girînada û hetanî bi Mozambîk, eşkere dikirin, lê Kurdistanê di bin çengê xwe de nedidîtin. Komonîstên Kurd berî yê Erebbidim, Kurd weke millet binav nedikirin û kesên ku doza mafê kurdan jî dikirin li cem wan cihê şubhe û tawanbariyê bûn, ango di eniya dijminên wan de bûn. Bi pêla çepîtiyê re, xwedê giravî, çare di sosyalîzmê de didîtin. Niha jî pêleke nû heye ku çareserkirinê di demokratiyê de dibînin. Hetanî bi Ewropîyan, ji bo dostên xwe yê Tirk aciz nekin, meselê girêdayî mafê mirovan dihêlin. Weha mesela kurdî binav dikin. Rewşeke weha hatiye holê ku mesela kurdî bûye mîna sêgoşeya BERMODA. Dibêjin sêgoşeyeke weha heye ku her tiştê derbasî sinorê wê dibe winda dibe. Di siyaseta li hember kurdan de jî, her tişt tevlihev dibe. Dema dibe mesela Kurdistanê, çepê Erebbidim dibe nijadperest, çepê Tirk dibe kemalist, çepê Ewropî dibe demokratîkxwaz û dijî şidetê û kurdan jî mîna neteweperest an nijadperest dibînin. Li hember kurdan jî dewleteke ewrûpayî carna ji dewleta Tirk serttir dibe û bêtir bi ser kurdên çalak de diçe. Temamî rojê, deqe bi deqe, vekirî qala mafê mirovan û demokratiyê dibe. Bi şev jî, gava ku çapemenî radizê, silah û çekan difroşin rêjîmên generalan. Nizanim çima em bê hemdî xwe herdem siyaseta û exlaq tevlihev dikin, tev ku mîna agir û avê ne. Weha xuyaye ku hemû hewildanên xweşikkirina rûyê mirovayetiye têk diçin.



Helim Yûsiv kî ye?

Di sala 1967 an de li Amûdê, rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye.

Li zanîngeha Helebê, Fakulteya Hiqûq qedandîye û ji sala 2000 î de li Elmanyayê dijî.

Bi dehan gotarên wêjeyî di kovar û rojnameyên erebî û kurdî de weşandine.

Heta niha berhemên wî bi kurdî, erebî, tirkî û elmanî hatine weşandin. Hemû berhemên wî yê bi kurdî jî hêla weşanxaneyê Avesta yê ve li Stenbolê hatine weşandin.

Berhemên wî yê çapkiri ev in :

Mêrê avis - Çîrok - 1991, bi erebî, Şam. 1997

bi kurdî. 2004 bi elmanî, wergêr : Heidi Karge.

Jinên qatên bilind - Çîrok - 1995, bi erebî Beyrût. 1998 bi kurdî.

Mîrî ranazîn - Çîrok - 1996, bi kurdî. ç2 2002. 1998 bi tirkî, wergêr: Rehmî Batûr.

4- Sobarto - Roman - 1999, bi kurdî. 1999 bi erebî, Beyrût. ç2 : 2004, Hewlêr.

5- Memê bê Zîn - Çîrok - 2003, bi kurdî.

Ji Şanoyên ku jî nivîsên wî hatine girtin :

Komara dînan,

Bidarvekirina pozekî,

Sol û serî.

Berjewendî bingeha tîkiliyane. Di rewşeke weha de jî, her yek ji me mîna (Sêzêf) ê belengaz dixwaze kevîrê armancên xwe ber bi jor de bigindirîne. Tev ku diyare jî ku tîkçûn an mirin serdeste, lê dîsa jî dunya ji Sêzêf û Donkişotan xalî nebûye.

Disa girdayî vê çanda mirovane; carcaran ku em bi kurdîbûna xwe mijûl dibin, em bi xwe jî xwe dipirsîn: gelo em ne nijadperest in? Helim Yûsiv wekî nivîskarekî Kurd çawa li vî pîrsê dinere? Ango nijadperestî çiyê, kengî kurdayetî sinorê mirovahiye derbas dike û dibe xeter! û kengî mirovahi xayintiyê bi xwe re dike, û dibe sêpiya dardakirina kurdayetiye?

Li Ewropayê û bi taybetî li Elmanyayê hesasiyeteke mezin ji peyva (Nationalist) - Nete-weperest - re heye. Ji ber ku Naziyan ev peyv bi awayekî bika-

ranîn ku heta roja îro bûye bela serê Elmanan li her deverê. Li her welatî li dîroka xwe ya dema pêvajoya bikaranîna vî peyvê, dîterpîlin. Şalê carekê jî, bi kêmanî lêborîna xwe ji cihûyan, weke mînak, dixwazin. Baweriya min ewe ku, berevajî rewşa ku li Elmanyayê çêbû, pêvajoya bîdestxistina mafê neteweyekê mîna netewa Kurd dikare bibe pêvajoyeke giring ber bi çêtkirina şert û mercên milyonên mirovan de. Ango dikare yekser tîkeve xizmeta pêşveçûna mirovayetiye de. Bi vî rengî peyva (Nationalist) li Kurdistanê dikare wateyê erênî hilgire. Bi navê netewa Elman Hitler milyonên mirovan şewitandin, lê xebata bi navê netewa Kurd dikare bibe sedem ku bi milyon zarok ji zimanê dayika xwe mehrûm nemînin û di dibistanan de pêperwerde bibin. Ev yek rê li ber pêkanîna peymanên mafên mi-


rovên jî vedike. Ez bi xwe jî nijadperestiye nefret dikim û wê weke tîgeheke xeter dibînim. Kesên nijadperest jî mîna kesên nexweş dibînim ku bi hewceyî dermankirinê ne. Lê divê mirov vî jî bibêje, pîrê caran nijadperestiya ku di nav hinek kurdan de derdikeve, reaksiyonin dijwarin li hember nijadperestiya Tirk û Erebbidim û Farisan. Nizanim çima di pîrsra xwe de tu cudayiyê dixî navbera kurdayetiye û mirovayetiye. Ji ber ku milletê Kurd bîndeste û di bin zorê de ye, zor jî zore, û zulmî lê tî kirin. Her gavek ber bi serkeftina kurdayetiye de, gaveke dijî zordar û zaliman, ango gaveke ber bi serkeftina mirovayetiye de. Rastiya kurdayetiye îro ro wehaye. Eger dewleta Kurdan serbixwe ava bû û Kurd li ser xaka xwe bûn desthilatdar, wê gavê, wê dîtinên me yê din hebîn.

Kurd dibêjin mirina di nav êlê de govende, ligorî lêkolînên zanîyarî jî mirov herdem dixwaze di nav wê xaka liser jiyan dîtîye, bê hembêzkerin.. Helim Yûsiv bi vî pîrsê re tucar mijûl bûye û bi gelemperî liser pîrsra mirinê ku rastiya din ya jiyanê ye, ev pîrsra ku bi Gilgamêş re çû gora wî bê ku bersivê jê re bibîne?

Nivîsandin bi xwe mîna wî gîhakî ye yê ku Gelgamêş dîtîbû û mar jê dizî. Ew gîhakê manê bû û sira mirinê kete devê marekî û pîrê çû, lê hewildanên Gelgamêş berdewam kirin, hetanî ku ew bi xwe jî mir. Heta vî kîlîkê, her ku Enkîdoyek li ber çavên min dimre, ew hêrsa Gelgamêş tî min û di nav wan hestên wî yê pirotestoyî de dijîm. Dadmendî di jiyanê de nîne, mirin jî tî û rengêkî tirajikomedîk dide vî jiyanê me ya seyr, ku ji her tiştî bêtir dişibe pêkenokeke sar ku kenê mirov pê nayê. Koçberiya her mirovî jî reşiya malzarokê destpêdike û bi reşayiya gorê bidawî dibe. Jiyan bi xwe koçberiyêke dijware di navbera her du reşayiyan de. Ew pîrsên felsefîk yê ku zarokêkî pênc salî jî de û bavê xwe dike, ez bi xwe jî heta niha wan pîrsan jî xwe dikim û negihîjtîme ti bersivên ku min rehet bikin, weke mînak, çima mirov çêdibe, çima mirov dimre û herweha ev xew çiyê ku nivê emrê mirovan dixwe...Zencîra pîrsên weha dirêj dibe û nivîsandin bi xwe gerreke li bersivan, lê gerreke tîkçûyî ye. Ji ber ku encam, mirine. Ez jî mirinê hez nakim û eger hat jî ezê bi sola xwe wê pêşwazî bikim. Her çiqasî hinek dixwazin wê weke bûyereke asayî û pêwîst û normal jî bibînin, lê li cem min tiştêkî dine. Tiştêkî wehaye ku mirov gav bi gav, kîlîk bi kîlîk, bîyî ku dil bixwaze, diçe cem. Mirin jî her tiştî bêtir nêzikî mirove û ji bo jiyanê carna xwexwepandin pêwîste. Ev mêvanê xwîngiran, ev mêvanê reş, ku bîyî soz û bê telefonkirin derbasî mala mirov dibe, divabû Xwedayê ku mirov û gerdûn afirand, çareyêke dîtir jê re dîtiba. Lê, carna jî xwîngîrîna û mirov bîriyê dike ji ber ku dikare dawîya êşê jî bi xwe re bîne. Her tiştê ku min aciz dike û gewdeyên razayî yê di hundirê min de şiyar dike, min li ser nivîsandiye û bi nivîsandinê re hinekî ew acizbûn, ew êş, sivik dibe, lê ez xemgînim ku ezê nikaribim li ser mirina xwe ti tiştî binivîsînim. Ew tecrubeyêke awarte ye ku mirov bi xwe tî re derbas dibe, bîyî ku mirov wê gavê mirî ye. Rastiyeke bi vî rengî heye, jîdayikbûn, mirin û evîn, sê tawanbarî ne ku nayêne dubarekirin. Her sê bûyer jî zulmeke mezin ji bo mirovan bi xwe re tînin.

Heyfa çavên jiyanê ku bi mirinê bidawî dibe.

Hevpeyvîn: Mûsa Silêman



Nevzat Bayram

Kî ji wan; Alman derewan dikin an Tirk?

Gelek Fûtbolîstên ji Tirkîyê lê bi nasnameya xwe ya netewî ne Tirk di ligên Ewropa de fûtbolê dileyizin. Her hefte televîzyon û rojnameyên Tirk di beşên xwe yê sporê de eihêkî taybetî didin wan. Wê heftayê kîjanî ji wan çî kiriye, çawa listiyê bi awayekî ji rastiye bi dûr yek bi yek dinivîsin, dinirxînin û xwedêgiravî dilê Tirkên û birçî şa dikin, xizanî û rebeniya wan bi wan jibîrkirin didin.

Mirov guh û çav bide televîzyon û rojnameyên Tirkan, wê bibêje belkî Ewropa dev ji jiyana xwe, kar û barê xwe berdaye û behsa fûtbolîstekî „Tirk“ dike.

Rojeva dawîya hefteya welatekî sedî sed bi fûtbolîstekî „Tirk“ dagirtî ye.

Ya li Almaniya guh û çavên 80 milyoni li ser Ümit Davala ye, ya li Belçîka 8 milyon Belçîkî behsa Serhat Akin dikin ku wî çawa lingên xwe li topê xistiye an golek avêtiye.

Balkêş e, Tirk venaşêrin ku ew fûtbolîstê ku welat rakiye ser piyan tenê di pênc-deh deqîqeyên dawî de beşdarî listikê bûye û ev tofan rakirîye..

Gelo fûtbolîstekî di pênc-deh deqîqeyên dawî de beşdarî listikê bibe û wê tofanê rake, çima di temamiya listikê de cih nagire?

Tirk pirsên weha „beradayî“ ku „cudatiyê“ derdixe holê û millet bera hev dide ne dipirsin, ne eleqedar dibin.

Li gel Tirkan derew ji rastiye xwestir e.

Rastî tal û derew şêrin e; bi ser de, rastî ne di berjewendiya wan de ye. Tirk bixwe rastî û derewan bi mîzîna xwe ya berjewendiyê dipîvin..

Pîvanên hiqûqî, exlaqî û navnetewî Tirkan girênadin.

Dagirkirina Kurdistanê û Qîbrîsê; qirkirina Kurdan û Ermenîyan, kuştin, sirgûn û destdanina ser mal û milkên Rûm û Cihûyan ji wan re baş e an na? Tirk tenê didin dû pîrs û bersîvên weha.

Divê welatek bê dagirkirin, gelek bê qetilkirin an na? Ev ne derd û kulê Tirkan e.

Bi rastî, ger li Mezopotamiya û Anatoliyê hebin, Tirk miletekî xerîb e. Gelo Tirkên li Asya jî wek yê vir in an li vir weha bûne sosret û gelên din jî şibandine xwe?

Laz, Gurcî, Alban, Çerkez, Tetar... Heta Kurd kirin şovenîst, nijadperest û faşîstên Tirk.

Mirov li kîjan Tirkçîtiyekî dikole di bin de rastî mirovekî ne Tirk tê. Tenê li Tirkîyê mirovek dikare bêje, „Dayika min Kurd, bavê min Çerkes, ez Tirk im“. An „Dayika min Gurcî, bavê min Laz, ez Tirk im“.

Li welatekî ku Tirk lê tune ne, Komara Tirkîyê heye ku ev li dinyê yekem nimûne ye.

Di dema Împeratoriya Osmanîyan de Tirk bi „bêidraqî“ dihatin binav kirin. Ji ber vê yekê Komara Tirkîyê bi plan û projeyên Brîtanîyan, bi destê Alban, Boşnak, Tetar û Makedonîyan hat damezîrandin.

Li Ewropa wek di dirokê de îro jî bi berberîya xwe tînen naskirin. Itali dibêjin, „Mamma mia (Dayika min) Tirk tînen“ û hevdû pê ditirsînin.

Humanîst û nivîskarê mezin Stefan Zweig di pirtûka xwe ya bi navê, „Li dijî Calvin Castellio an li dijî koletiyê ramana azad“ de eşkere dike ku yekî xwedêgiravî gunehkar weha tê tarifkirin: „Kesekî ku Yahûdî, Tirk û şeytan ketiyê hundirê wî“. Di sedesala 16em de ji aliyê dêra ku xwe bi engîzîsyonê diparast şibandina Yahûdîyan û şeytênê famkirin. Le Tirk bi şeytên re çî dikin û dêr çima navê herduyan bi hevdû re bi bîr tîne?

Welhasil, derd û kulên Tirkan xelas nabin.

Em vegerin ser mijara xwe. Ji van fûtbolîstan du bira Hamit û Halil Altintop di Schalke04 û Kaiserlautern de dileyizin û gelekî serkeftîne. Hamit û Halil Altintop du birayên Kurd in û medya Alman wan bi nasnameya Kurdî dide nasandin.

Hamit û Halil yê di medya Alman de Kurd, di medya Tirk de dibin Tirk.


Her weha li Swîsreyê jî du birayên fûtbolîst yê gelekî serkeftî hene, Murat û Hakan Yakîn.

Murat û Hakan yê li Swîsreyê Kurd. li Tirkîyê dibin Tirk..

Bi Tirkî îdyomek weha heye, „Delidir, ne yapsa yeridir“ ango dîne, çî bike lê tê.

Xwezî pîrs tenê ewqasî rehet bûya.

URFAN ALPARSLAN NEMIR E (1945-.....)



**Amadekar:
Muzaffer Özgür**

Tekoşîna serxwebûn û azadiya gelê Kurdistanê, li ser xwina bi sedhezaran şehîdan bilind bû. Îro gele Kurd, li Kurdistanê azad şehîdên nemir û paye bilind, di tekoşîna xwe de dide jiyandin. Ew şehîdên me di jiyana me de dijîn. Nemirin. Yek ji wan şehîdên me jî Urfan Alparslanê.

Urfan Alparslan, di sala 1945an de li bajarê Agirî, li gundê Mîrengiyê hatiye dinyayê. Wî, xwendina xwe ya seretayî li wir xelas kiriye. Paşî di dibistana mamostatiyê de xwendina xwe domand. 1967an de dest bi mamostetiye kir.

Dema mamostatî dikir, ji ber xebatên xwe yê şoreşgerî û welatparêziyê gelek caran sirgûn bû. Ji ber zilm û sirgûnê tucar ranewesta, poşman nebû û dest ji xebatên xwe berneda.

Urfan Alparslan mirovekî dilpak, nefis-bîçûk û dirist bû. Ji ber wê qerekerî xwe, di nav refên şoreşger û welatparêz de xwe da hîskirin û qebûlkirin. Di sala 1979an de ji bo Serokatiya Beledîya Agirî bû berendam. Êrişên dewletê her rojê zêde bûn. Partiyên birjûwa, polis û leşkerên Tirk hemû li hemberê refên sosyalîst û welatperêz kar kirin, lê Urfan Alparslan biser ket û bû serokê Beledîya Agirî.

Dema bû serokê beledîyê li gora îmkânên xwe karûbar ji gel re dikirin, gel ew kir rêber û bawerîya xwe pê anî. Hêzên dewletê her roj êriş û provakasyonên xwe zêde dikirin. Rojekê bi 75 hevalên xwe ve hat girtin. Paşî sûtqest çêkirin û ew birîndar bû. Êrişên qirêj tucaran Urfan Alparslan ji tekoşîna gelê wî paş de nehişt. Xebatên xwe yê gelê bi xebatên siyasî ve gireda û bi awayekî kollektîf digel hevalên xwe

xebitî.

Ji ber ku beledî bibû keleha welatparêzan û di demeke kurt de xebatên beledîyê pêş de çûbûn. Dewlet û hevalbendên wê ji rewşê aciz bûn. Çend rojan beriya 12ê Îlona 1980yî ji aliyê wezîrê hundirîn ve serokatiya beledîyê ji Urfan Alparslan „hat sitandin“. Lê edî bûbû parçeyek ji gelê xwe. 12ê Îlonê çêbû, bi biryara rêxistina xwe derbasî Kurdistanê rojhilat bû.

Urfan Alparslan û grubek hevalên wî ji bo dîtinên cûda ji rêxistina xwe dûrketin. PSKT-Roja Welat ava kirin. Wan di 1986an de Tevgera Sosyalîsta Kurdistanê (TSK) avakirin û bi biryara bilindkirina tekoşîna li ser axa welat li Rojhilata navîn cih girtin.

Urfan Alparslan, bi navê xwe yê din Kamîlê Reşo, avakirin û parastina Kurdistanê serbixwe-azad û demokratîk ji xwe re kiribû armanc. Wî, bawer dikir ku şoreşa Kurdistanê, encax dikare di riya tekoşîna çekdarî re bighîje serfiraziyê. Bi wê baweriyê di damezîrandina Ordiya Rizgariya Kurdistanê (ORK) de cih girt û vegeriya welat.

Dema Kamîlê Reşo giha Kurdistanê weha got: „...biji Kurdistanê serbixwe, azad û demokratîk!“

U. Alparslan û hevalên wî bi leşkerên kolonyalîstê Tirk û ceşên wan re di Îlona 1988an da li sînorê Uludere-Beytüşebab dest bi şer kirin. Ew şerê wan 3ê Oktobera 1988an da li Uludere çiyayê Torisanê bi kîmyabarandina Tirkan bi dawî bû. Urfan Alparslan (Serdar Ararat) bû stêrk û ji ezmanê Kurdistanê rîjiya.

Îro bilindkirina tekoşîna li ser axa welat bi cih hat û Kurdistanê Federal, azad û demokratîk ava bû.

Çavkani: Hêviya Gel



Jinekolog, mîrekolog, dinokolog, Prof. Dr. Fatê Were Civatê

Fatê xanim, ê min zor spasî ewe dekem ke ewe eve yek sale derdi ême kêsa, be fikir we

Şêxbat

şewirmendiyeke çak pîrsgirêki ême çareser kird. Berastî ta êste min jinekolog ve Dinokologî weki tû zîrek nedîwa. Be xêrî tû êmin fêrî kişandîni "eroîn, kokain, morfin we jehrîn" bûm. Bi xêrî tû fêrî "dîrew we dijûnkirdin" bûm. Bi xêrî tû fêrî "qehpebawî we zinêkarî" bûm. Berastî be xêrî tû fêrî her "jehrekan" bûm. Êste êmin şêt bûme, din bûme we alkolk bûme, hemî bi xêrî tû! Hey gewende, min qurbesere êste çî bikem haal?

Ehmedî Xencensor / London

Kaka berastî êmin nadzanim bilêm çî? Bo bitwanim yarmetî Kurdekani qurbeser bikem êmin her gû xwardim, belam ewe razî nabeyn, min çî bikem kaka! Hey segi segbaw, ewe yek sale êmin derdî ewe dikêsim, fikir didime bo we, aqil didime bo we, hem jî ev kare bêpare bo ewe dikem, weki Mam Celal elok naxwazem! Berastî ewe ne ûydan mawe ne din ne îman! Ewe yek sale min aqil we fikrî xom gişt dame bo we, belam ewe ta êste yek mîrîşkekan jî bo min serjênekirdîwa. Ma Kurdewarî eweye kaka? Hey bêûydan, tû bi xêrî min fêrî herşiteki bûyî, tû her gû

xwardî ma êdî çî dixwazî kaka? Heger ê tû ev şitane li Zanîngehî London fêr bibûya dizanî ta êste çend pare dabûy haa? Sedhezar Dolar! Belam êmin ne elok xwestim, ne mîrîşk, ne Kerkûk ne merkûk! Yek şitek xwestim, "tû bibî zawe min jî bûk!"

Xaltika Fatê, ez yeksaliya te û Peyama Kurd pîroz dikim. Birastî ez û malbata xwe jî te pîr hez dikin. Bi taybetî jî mêrê min pîr jî te hez dike. Em carna lîser te bihev diçînin jî lê dîsa jî ez jîbo xatîrê te dengê xwe nakim ha, çilobe em jin divê li hevdu xwedî derkevin û rê nedîn van zilamên bêbext. Te heta niha gellek caran rê lîber me ronî kir, bi ramanên xwe rêberîya me kir, mala te ava. Birastî min tiştêk meraq dikir. Keçka min carê dibêje "yadê, ez diçim diskotekê". Lê nabêje diskotek çîye. Ka jî kerema xwe bêje bê mana diskotekê çîye lê! Ez jî mêrê xwe jî dikevîm şîkê ku ew jî diçe diskotekê çî quzilqurte, de ka bêje!

Eysoka Nanpêj / Alamanya

Wey xwedê jî te razî be, xwedê nan jî tenûra te kêrî neke rebbî! Rast e, erê zilam bêbext in, lê bawerke bê wan bêbextan jî nabe haa! Ne bê xiyaran dibê û ne bê hêkan, cacîqa bê xiyar û mîrîşkên bê hêk qet nayên xwarin. Silavên min li zilamê xwe bike û bêje bê Fatê gotiye "bila rojêkê stuyê xwe

bişkîne bibe mêvanê min" temam! Te go diskotek çîye? Waweylê waweylê waweylê, ma tu nîzanî bê diskotek çîye qirikê? Keçê "lotikxane" ye lotikxane bêmiradê! Axurê dewaraye ha! Keçka te diçe li wir lotkan dîde xwe, têra xwe tir û fîsan dike û tê. Belkî gon jî dixwe ma kî zane! Sedî sed zanim mêrê te ne jîbo xêrê diçe lotikxanê. Lê heger tu meraq dikî, xwe himra û bodra bike, çarşefa xwe li xwe ke û tu jî wek siya-setmedarên me lotka bide xwe!

fate@peyama-kurd.com

Pêkenok

Evdo li otelê dimîne. Dixwaze dakeve barê û tiştêkî vexwe. Lê naxwaze kes pêzanibe go ew Evdo ye. Radibe diçe ber mirêkê (ayna) û dest bi provê dike.

- Ka fîskûkê.....na wê wîlo zani-bin go ez Evdo me

-Ka raki.....na na wê dîsa di min derxin

-Ka bîrakê.....hah, ev temam e, bi vîna kes min nasnake

Xwe bera jêr dîde, rûdinê û bangî barmen dike:

-Ka bîrakê bide min

Ê barmen hinekî diponîje, li Evdo temaşê dike û dibê:

- Niha tu ne Evdo yî?

Evdo ecêbmayî dimîne

-Errrrrik te çawa famkir loo?!

Barmen:

- Vêderê resepsiyon e, ne bar e. Bar li aliyê din e loo!...



Beran (21.03-20.04)

Pêşniyazi hene, herî biryarê biponîjin. Fersendan baş bikar binin. Lezû-beza zêde ne baş e.



Gamês (21.04-20.05)

Jî evîne re wext veqetînin. Her tiştî jî her hesî re nebêjin. Derkevin seyranê, bêhna xwe berdînin.



Cewî (21.05-21.06)

Daxwazên berz bi we re hene. Bila bûyer we nexin heyecanê. Hinekî din erênî û tenhawer bin.



Kevjal (22.06-22.07)

Zorê li hezkiriyên xwe nekînin. Bi malbata xwe re pev neçînin, zêde nedîn dî bûyeran.



Sêr (23.07-22.08)

Hûn di nava hisên kûr denin. Bûyerên rojane karin zorê li we bikin, lê bi aram bin, giran bin.



Simbil (23.08-22.09)

Bala xwe bidin pêşeroja xwe. Di tengasiyê de alkariyê jî dostan bixwazin, bilivin, bigerin.



Mêzên (23.09-22.10)

Ramanên we tînin guhertin. Projeyên pêşerojê çêkin. Têkiliyên hevaf evîne bi xwe re tîne.



Dûpîsk (23.10-21.11)

Bawerîya we bi we heye. Hûnê kes û civatek biyan binasin. Herin şahiyekê, kêfa xwe bikin.



Kevan (22.11-21.12)

His û vîyana (îrada) xwe kontrol bikin. Erkên xwe binin çîh. Aciz nebin, rojên pêş bifikirin.



Kovî (22.12-19.01)

Evîndarî heye, derd û mitalên xwe bi hezkirîya/yê xwe re hevbeş bikin. Sakin û tenhawer bin.



Satîl (20.01-18.02)

Rojek xêrê ye, moralê we vedibe. Erêner bin û di serê xwe de zelal û ronak bin, bilivin.



Masî (19.02-20.03)

Hûn bi tevgera xwe bandorê li derûdora xwe dikin. Alkariya malbat û mezinên xwe bikin.

Çengelpîrs

Teyare, firfirok	Heram, qedexê	Jiber vê, sedem	Rêxistînek îslamî	Wîlo, weha, wer	Nivîskarê li wêne	Li Swîsreyê çemek	Selîka dara, selîka tîrî
					Şêwe, şîkil		
Bi inglîzî gok, top			Seqem, cemed				Nîşank
Navejî jinan				Çemekî Kurdistanê	Milletek		
			Mezel, qebir	Zadê hêrayî, toz		Sermil, perçêkî laş	
Sînîr, acizî	Deng, awaz	Şewat, êş, germî Damar, kok			Kurtegotina Emîna		Dadmendî, heq, hiqûq
				Kevneşopî		Notayek Notayek.	
Navê çekekê Bingeh, reh		Nîjad, qewm Tîpa şeşem			Bajarekî Kurdistanê		
			Jî niha û pêde	Paq, laq, çîm	Navê jinek Ewrûpî Yan, yan jî		
			Rêxistînek Îrlandayê			Rojek	Mam, ap Be Erebi "na"
			Mêrkuj, kujer Ruh, giyan			Alaya piçûk	
					Xweşî, berfirehî		



Pêkenok

Evdo jîbo karekî diçe Mêrdînê. Dibêje „de her ez hatime heta vir, ezê serikî bidin kerxanê jî“. Diçe jî jinikê dipirse:

-Ma bi çi qasî ye?
Jinik dibêje:
-Di nav nivînan de bi 5 milyonan, lîser lîngan bi milyonekê!

Evdo 5 milyonan derdixê û dîde jinikê. Jinik dibêje:

-Aferim, naxwe tu dixwazî di nav nivînê de îşê xwe bikî!

Evdo dikene:

-Na, na, ezê lîser lîngan çêkim, lê ezê 5 carî çêkim!

Laetitia Casta

Ew di 15 saliya xwe de, li ber deryayê ji aliyê fotografekî ve hat dîtin û riya şohretê li ber vebû. Yê fotograf ew bir cem ajan-seke modêlan û ji wê rojê ve Laetitia li ber çava ye. Ji defileyekê diçe yeke din û temamê markeyên navdar li pey wê digerin. Li kêleka karê modêliyê û reklaman ew karê sînemayê jî dike. Ew gihîşt wê radeyê ku ji aliyê Frensawîyan ve weke Marianne were dîtin ku sembola Frensa bû.

Laetitia xwediya bedewiyeke bînimûne ye. Bi rûdêna xwe, bi çav û birhên xwe û bejna xwe ya lihevhatî ew weke bûkeke lastîkî ye. Lê ew jî weke hemû bedewan kar û xebateke bê rawestan ji bo parastina bedewiya xwe dike.

- Ji bo ziraviya bejna xwe: Yek ji çekên Laetitia bedena wê ya lihevhatî û tije ye. Ew ne mîna gelek modêlan bi tenê ji hestî û çerm pêk tê. Kulîmek û sînga wê dagirtî ne. Ew dibêje ku tu parêzeke wê ya taybetî tune ye, lê ew xwe ji hinek xurekên bi dohn û arvan dûr dixê. Ji bo ku çermê bedena wê ziwa nebe, ew rojê 3 litir av vedixwe.

- Spor: Liva ku kêfa Laetitia jê re tê, meşa li ber deryayê ye. Ew li giravekê di nava Deryay Spî de mezin bûye û girêdaneke nedîtî di navbera wê û deryayê de heye. Herwiha tê gotin ku ew xewar e û temamê zemanê xwe yê vala, bi xewê diborîne.


- Ji bo porê xwe : Ew xizmeteke mezin ji porê xwe yê kestanî re dike. Ji bo kêmkirina ziyana mekîna ziwakirinê û ziyana ku gemara hewayê dide por, ew herdemê şampoyeke ku porê xwedî dike û diparêze bikar tîne. Ew krêma nermkirinê û biriqandinê jî ji himama xwe kêr nake. Heta ku jê tê, porê xwe li ber hewa derve ziwa dike. Dema ku ew mekîna ziwakirinê jî bikar tîne, hewl dide ku germiya wê ne zêde be û serê porê xwe bi krêmekê diparêze.

- Ji bo çermê serçavê xwe: Krêma ku ew rojane, li dijî ziwabûnê bikar tîne, Futur E ya L'Oréal e ku di aliyê vitamîna E de dewlemende û rê li ber qermeçandinê digire. Laetitia di derbarê vê krême de dibêje, „pir balkêşe ku ev krêm him rojane kar dike û him jî hesabê pêşeroja çerm dike û wî ji êrîşên derveyî diparêze“. Laetitia pir hesab derdikeve ber rojê. Ew di kelkela germa nivro de dernakeve û dema ku derket jî xwe dide bin sîberekê û krêmeke ku wê ji tîrêjên rojê yê dijwar biparêze, bikar tîne.

- Ji bo mekyaja xwe: Çavên wê şîn ezmanî ne. Ji bo ku wan derxe pêş, ew pişt çavên xwe bi rengên kestanî û bêj derman dike. Ew tucaran pişt çavên xwe, weke rengên çavan şîn nake.



Zelal



Navenda Zelal

Liza GmbH
 Köpenicker Str.
 22-25
 D-10997 BERLIN
 Tel.: 030 390 380 30
 Fax: 030 390 380 84

Bayiyen Zelal

AKCAN GmbH
 Hamburg
 Tel.: 040 723 402 96

AKCAN 2
 Bremen
 Tel.: 0421 691 96 78

CAN GETRÄNKE
 Essen
 Tel.: 0201 289 74 17-18

CAN GmbH 2
 Köln
 Tel.: 0221 37 79 408

ESD Softdrink GmbH
 Mannheim
 Tel.: 0621 318 76 70

LIZA GmbH
 Berlin
 Tel.: 030 61 62 98 11

TRINK-One
 Düsseldorf
 Tel.: 0211 15 79 881

TRINK-SEM
 Dortmund
 Tel.: 0231 981 86 23

Strana kurdî di xodika hinek bîrhatina de

Dewleta Elî

Hêştê em zarok bûn dema bendikê evîne di navbera me û kultûra me de hatine raçandin. Daykûbabê me çî cara delîve neda hindê ku em ji ziman û kultûra xwe dîr kevîn û wînda bikin. Her dem behsê şeroka, zibara, daweta, gêjna, sersala, mazîchinê û bêrê, bo me dihate vegêran. Hemî dema hizra me li hindê bû, ka dê kengî rêvîngê ji gundî bêt û qesta mala me ket û me ji gêleşûka xerîbiyê derêxît û bibe nava jiyaneke kurdewarî, ew jiyana daykûbaba bo me kiriye xewneke ciwan. Ne bi tenê keyfa me ew bû ku mêhvanê me bihêt û çandik û parzînkê wî pir bin ji gwîz û mewîja, bahîva, ketka, sewkê hejîra, sêv û ,hilwîka, kezan û lûçîska û bêmka, lê ya ji me ve ku her gopkek û rîşalokeka rengîn ya wan çandik û parzîna, bi dehan çîrok û serhatî yê bi xwe ve înayîn, wek çîroka Mîrza Mihemed, Rostemê Zal, Hespê Reş, Xanê Lepzêrîn, Mem û Zîn..htd. Yan jî stranek ji wan stran û beytê


serhatî pê dihatine vegêran. Bîra min dihêt, ez zarok bûm, dema êk ji van mêhvana dihat, xew bi çavê min ne dikeft heta ku min çîrokek yan stranek ne bihîstiba, hingî dê serê xwe danime ser balgîhê xewn û xeyalê ciwan. Eve bû hesta min li biçûkiyê. Dema ez mezin bûm ji nû hizrê min vegêştin û dîr çûn. Tiştê herî ecêb li cem min ewbû, ka çawa ev kultûrê hosa bihagiran hatiye gotin û kê gotîye, kê vehandîye û vegêraye û çawa nîfş bo nîfşî bi vî terzê ciwan hatiye veguhaztin û parastin. Eşqa min bo stran û çîrok û kultûrê kurdî ji zarokatîyê destpê kir. Dibît eve jî ji ber hindê bû ku dayka me dengekê xweş hebû û her car bo me stranê kurdî digotin û vedigêran, heta ku em jî hînî strana kurdî kirin û evîna wê di dilê me da çandî. Ev evîne li destpêkê, xweşiyek û keyfeka zarokatîyê bû, lê dema em mezinbûn û me fêhm ji dinyayê kirî û pêtir nêzikî civaka kurdî bûn û me jiyana kurda û kurdewarîyê dîtî, dengê Miryemxanê, û Mihemed A'rif û Kawîsaxa û Gulbiharê, helbestê FeqîyêTeyra û

Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî û gelekên din pêtir çûne di guhê me da û pêtir em têgehîştin, ev evîne bû eşqeka mezin. Me jî nû zanî ka stran û çîroka kurdî çend ya zengîne û bihaye. Eger mirov hûr û kûr biçîte dinav strana kurdî da û guhê xwe bidetê, dê ji nû zanî ka çend ya bi jiyana me ve girêdaye, ka çawa wan bi wê xweristîya xwe ve, hemî tiştê girêdayî bi jiyana kurdewarîyê ve, di strana da tewzîf kirîne û bikar înanê. Ger mirov çavê xwe biniqînê û guh bidete strana kurdî ya folklorî û hizrê xwe di her peyvekê da biket, dê kevîte di xeyaleka ciwan da, dîmenekê ciwan dê kevîte ber çava, ger destê nexîşkêşekî digel xeyalê mirovî da bît, dê kevîlekê bê mînak di berra nexîştin. Strana kurdî straneka pir xweşe, pir me'na û mereme, selîqa wê mirovî dibete dîr, tama xweşîya wê ne bitenê di muzîk û peyva da ye, tama wê ewe ku ew çîrok û çîroka milletekî vedigêrît. Her wesa bi nisbeta çîroka kurdî, her gaveka destek û hîzreka xudan hiner û şîyan têda bixebitin, lê ji kultûrê kurdî û

jiyana kurdewarîyê nederkevin û çîrûka kurdî sînaryoyek jêra bihête danan da bibite filimek û me gelek nimûne bo xweştirîn çîrûk û dastanê kurdî hene, her wesa me welatekê hey, nimonê ciwanî û xweşîyê ye, dema ev tişte hemî vêk bikevin, dê di demekê kurt da sînema kurdî jî li dinyayê deng vedet. Her bi vî rengî, strana kurdî, nexasma di vî serdemî da, ku kilîpê rewaca xwe dîtî, lê pa mixabin emê hinek kilîpa dibînîn, gelek ji me û jiyana me û tîtal û rewîştê me dîr, mixabin ev strana kurdî ya hosa biha giran û pir me'na, ev strana peyvê wê dastana jiyana milletekî vedigêrin, di gêleşoka hinek peyv û mirov û dîmenê dîr ji me û kulturê me, berze bibît. Eve ye cihê tîrsê ku roj bo rojê em hemî tiştê xwe wînda biken û binavê pêşkeftinê, paşbikevîn û wînda bibîn, û kes nezanî ka em çî milletî, ji ber her milletek bi kulturê xwe tete niyasîn, dema em tîna û strana xwe di çarçûvê kulturê milletekê dî da dibêjin û dideyne ber çav, em kesatî û xweristîya xwe û millete xwe

wînda diken. Çend tiştê jêhatî û taze ye dema ş'ireka Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Melayê Cizîrî yan jî Ehmedê Nalbend yan peyvê her ş'irekê dî ye kurd, bi wî teswîrê xwe yê ş'irî yê bi hêz, bihête klîpkin, bê gomane dê tiştêkê pir hêja jê derkevît. Pêşkeftin ne ewe ku stranbêj parekê zexim li stranê bimezêxît, komeka jinkê rût, bi hemî reng û rewîştê xwe ve, ji me û jinka me dîr, li xwe bicemînê û bi reqaseka ne ciwan, û muzîkeka bilind stranê bêjît. Em ne dijî pêşkeftina stran û musîka kurdî ne, belê pa stran jî rêkeka taşandinê ye, nexasma bo zarokê me. Gelek stranbêjê kurd, strana kurdî bi rengekê pir ciwan li Kurdistanê klîp kirîye, dibît pareyekê kêmtir lê mezaxtîbît, her bi destê derhîner û hunermendê me hatîne çêkirin û li dîf rewîşt û xweristîya me û jiyana me kurda, vê stranê cihê xwe kirîye û mirovê kurd pêtir kêşaye xwe. Bi vî rengî de stranbêjî cihê xwe pêtir hebît di nav dilê xelkî da û de pêşkevît. ■

3. Festîvala çand û huner ya Heskîf û Batmanê 27ê Îlonê dest pê kir



PK - Festîvala çand û huner bi muzîk û stranên hunermenda Kurd Tara Caf dest pê kir.

Di berdewamiya festîvalê de, li gel konsêr û çalakîyên din yê hunerî, li taxên Beşevler, Huzur û Şafakê 3 Malên Gel hatin vekirin. Li kêleka Malên Gel, kolanên bi navê Mehmet Sîncar û Mîmar Sînan jî ji bo çûnûhatinê vebûn.

Serokê Şaredariya Batmanê Husyîn Kalkan da zanîn ku Festîvala Çand û Huner ya Batmanê di pêşveçûn û nûkirina bajêr de xwediyê roleke girîng e. Kalkan da zanîn ku wan di festîvala yekemîn de "Kolana Huner" di ya diwemîn de "Cadeya Gulistan" vekirine û xistine xizmeta gelê xwe.

Di festîvala sêyemîn de jî li Batmanê Salona Sînemê ya Yılmaz Güney, Cadeya Mîmar Sînan, Cadeya Mehmet Sîncar û 3 Malên Gel hatin vekirin.

Ji NAVENDÊ ji bo Karsazên Kurd pirtûkek balkêş

PK / Bonn - Navenda ji bo Lékolînên Kurdî- NAVEND bi navê „Rênîşanka Karsaziyê ji bo Mişextên Kurd“ pirtûkek ji bo karsazên Kurd ji Almanî wergerand Kurdî û weşand.

Serokê NAVENDê Metîn Incesu di pêşgotinê de armanca weşandina vê destpirtûkê wiha tîne ziman: "Ji bo çareserkirina

pîrsên karsazên Kurd, yê weke amadekirina avakirina şîrketekê, îmkânên finansî, xwegihandina tedbîrên alîkariya vekirî û saziyên şewirmendiyê, NAVEND dixwaze bi vê pirtûkê agahdariyên bingehîn pêşkeş bike".

Pirtûka destî „Rênîşanka Karsaziyê ji bo Mişextên Kurd“ ji aliyê Hasan Kalçik ve ji Almanî hatiye wergerandin.

Li Diclê, pêşbaziya lîlandinê



PK - Di Yekemîn Festîvala Çand, Huner û Werzîşê ya Diclê de, roja diwemîn roja tilîliyan bû. Festîvala Diclê ya ku ji aliyê Şaredariya bajêr ve hat lidarxistin, di roja diwemîn de bi tilîliyan geş bû. Di diwemîn roja festîvalê de, 19 jin ji bo lîlandinê ketin pêşbaziyê.

Her jinek bi tena serê xwe derket ser dikê û heta dawîya nefesa xwe lîland. Ji bo destnîşankirina 3 jinên ku bi baştirîn dengî lîlandin, endamên juriyê zoreke mezin kişandin. Her lîlandinek ji ya din xweştir bû. Di encama pêşbaziyê de xanima bi navê Suzan Dogru yekemîn, xanim Asya

Arikan diwemîn û xanim Munevver Yildirim jî sêyemîn hatin hilbijartin. Piştî diyarkirina encamê pêşbaziyê, hersî xanim derketin ser dikê û bihevê li yek dengî lîlandin. Xanima yekemîn bi sarincekê, ya diwemîn bi mekîneya kincşûştinê û ya sêyemîn jî bi lîreyeke zêr hatin xelatkirin.


Piştî pêşbaziyê, hinek jinan gawîncên xwe birin ber destê endamên juriyê û gotin ku mafên wan hatiye xwarin, hinekên din jî ji ber wendakirina pêşbaziyê, ji aliyê zîlamên xwe ve hatin rexnekirin.

140 Roşnvîr mezeli Mala Mistefa Barzanî ziyaret kerd

Barzan - Qedyayîşî Festivalê Duhok ê roşnvîrî ya pey, her çehar parçê kurdistan û karkasya re 140 roşnvîr û nuştoxî kurd mezeli Mala Mistefa Barzanî û Îdrîs Barzanî ziyaret kerd.

Bi nameyî ne kesan nuştox Ordîxa nê Celîl qisêkerd û va: "Hunî şima hê dî hêdî hê yenî ca û Kurdistan ho hetî azadiya şino. Ma ewro amê hizurî şî ma ke sozî wefadariye xo biyarim ca"

Nuştox Malmîsanij Hewler de Bedirxanî û Cemîlpaşazadeyan ser semînar da



Hewler - 26î elûl de nuştox û cigêrayox M. Malmisanij Hewler de, komelê Kawê de di keyanî kurd, Bedirxaniyan û Cemîlpaşazadeyan ser yew konferans da.

Malmisanij derheqî Bedirxaniyan de îna va: Bedirxanî mîrî Boatn bî. Na mîrîtiye seserrê 18. de hukumdariye no Cîzîra Botan re heta Amed û Serpendej kerd hîra, la cuwa pey osmaniyan na mîrîtiye orte ra darit we û Mîrî Bedirxan surgunî stenbol û Gîrît kerd.


Malmisanij cuwa pey tomanî Bedirxan myanî tevgerê xelaskerdişî kurdistan de zaf cayo muhîm girot va û qisêkerdişî xo îna rûmna: Rojnameyî kurdî yo vîrîn „Kurdistan“ Mikdat Bedirxan vet. Bingehî ziwani kurdî yo modern Celadet Bedirxan û birayî ey Kamuran eşî.

Malmisanij derheqî Cemîlpaşazadeyan de zi, keyê Cemîlpaşazadeyan Diyarbekir de mendiyen û îta de yew keyeyo xanedan bi va û myanî tevgera kurd de rolî înan ser zi îna va: Keyeyî Cemîlpaşazadeyan re zafîn myanî Kurt Teali Cemiyeti ê stenbol û şubeyî Amed, de ca girot. Serewedartişî kurdan ê 1925 de dewlet no keye re 11 kesî tepîştî, la nêşkayî alafayî înan û Şex Seîd tespît bikerî. Cuwa pey bi taybet Kadîr Cemîlpaşa û Ekrem Cemîlpaşa myanî tevgera kurd de rolo muhîm girot.

Dr. Kemal Kerkûkî: Samedî gueşdarî kerdişî waştayanî şarî kurdistan hercayî kurdistan de buroyî parlamento abenî

Kurdistan - Heftekî viyert cagirotê serekî parlamentoyî kurdistan Dr. Kemal Kerkûkî dewê navçeyî Cavayet Xorxor de yew merasîmê vîrardişî şehîdan de mij dîni yew biyayîşî her di îdareyan de.

Dr. Kerkûkî qisêkerdişî xo de kar û gurê ke parlamentoyî kurdistan samedî keyeyanî şehîdan plan kerdî, ardî ziwani va: Ma nika di îdareyî, îdareyî Hewlêr û Silêmanî. La ma nêzdî de nê wird îdareyan kenî yew. Parlamento samedî gueşdarî kerdişî waştayanî şarî kurdistan Helebçe, Silêmanî, Duhok, Zaxo û cayanî binan de buriyan akeno. Gereka ma samedî keyeyanî şehîdana zaf çî biker. Ma gereka erd



bidi înan, ma gereka bananî înan virazi, ma gereka meaşê înan zêdbikeri.

Festîvalê Duhok ê Roşnvîrî serkote qediyay



Dihok - 22-23-24î elûl de bajarî kurdistan Duhok de, hewşê Hotelê Jiyandewê Festivalê roşnvîrî viraziyay. Na festîval de her çehar parçeyî kurdistan re roşnvîr, nuştox û hûnermendana na festîval de ca girot.

Festîvalê Dihok ê roşnvîrî bi qisêkerdişî walî Duhok Temir Remezan abî. Temir Remezan na festîval cewabî hêzenî tarî, şovenîstan

û ê ke nêwazenî kurd yewbî, verba înan a va û qisêkerdişî xo îna rûmna: Însalah na festîval bena destpêk ke roşnvîr û pisporî kurd bînatê xo de vînayeyanî xo, zûnayê xo, tecrûbê xo piya barkerî. Ma pê kêfweşî ke kurdistan de bi sêyan kovar û rojnameyî serbest yenî vilakerdiş.

Serekî "Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Duhok" Hesên Silêvanî zi, Duhok

bî yew bajarî kurdayetî, çimkî her parçeyî kurdistan re roşnvîr û nuştoxî Dihok de yewbinan vînenî, va.

Nê hîrê rojan de nuştox, pispor û cigêrayoxanî kurd ciya-ciya temayan ser semîner dayî.

Festîvalê Duhok bi diruşmayî (Vatê kurdî sinoran derbas kenî) amê viraştîş. Na festîval Yekîtiya Nivîskarên Kurdistan organize kerd.



Selim Çürûkkaya

Lew û Beyrax

Vûnî ke serekî belediye Diyarbekir lew naya beyraxe (Ala) tirkûna.

Liya nê di riy vatên ez Kurda, çiney ra îna kerd?

Ez şaş biya menda, mi taway fehîm nêkerd!

Nûn zi şima vûnî; eceba ma siyaset ra fehîm nêkenî!

Ez vûna ke o zi sey Helîm Abak o.

Şima nika persenî:

Helîm Abak kam o?

Bo ez şima re vacî:

Helîm Abak, Diyarbekir ra bi, o yew dewij bi, ma piya hepîxaneyî Diyarbekir de mendî.

Ez û o ma yew qowîş de bî.

Eskerî yew roj ame û ma ra va:

Ma ra vaciyen "Komutanîm" û silûm bidiyen alê ma.

Ma va nê!

Eskerî tirkan va:

Ma di sehet wext dîni şima, xo re mişeviryê xo bikên.

Ma amê piyaset, ma mişeviryê xo kerd, mi va:

Ma înan re vacî "komutanîm", ma silûm bidî alê înan, nê ma nêgerên, uca ra pey yewna çî veciyeno. Ma destî înan re nêxelisiyênî.

Helîm Abak ca de yers bi va:

Selim xoca, taway nêbeno, ma silûm bidî al, ma vacî "komutan"

Mî va:

Helîm bo ti ewro silûm bidî al, ê siba to re vûnî ke Selim re nengan biçîn. Ê mi ra zi vûnî ke Helim re nengan biçîn

Helim va:

Nê, ez ney nêkena. Roja bin esker ame ez berda hucre, Helim qowîş de mend.

Ey uca de silûm da al, şêş aşma pey, esker yew embazî Helim ra vûno:

Helim re nengan biçîn. Embazî Helim ci re nengan çineno. Na ray esker Helim ra vûno:

Ti embazî xo re nengan biçîn

Helim zi çineno.

Bacê ê yeni zerrey qowîş, Helim şino yew merdimî zûnaye het î vûno:

Selim û Yuzbaşî Esat hê piya xebityenî O zûnaye Helim ra pers kenî:

La ti ça ra zûnî?

Helim vûno:

Şêş aşm cuwa ver Selim va ke eger ma silûm bidî alê tirkan, uca ra pey ma ra vûnî; "embazanî xo re nengan biçînên." Ewro ma nengî çinay yew binan. Ez tehrmin kena ke Selim yuzbaşî ra vawo, la ey ça ra zûnên?


No merdimî zûnaye ewniyeno Helim ra î vûno:

Qebahat Selim çino, ma ehmaqîb

Serek belediya Diyarbekir zi sey Helimî.

La ez wazena ey ra vacî ke wilay ti ewro lew na ala, ti siba lew k... înan ra nî zi, ti hanc nêxelisiyênî

Kitabî "Rastnuştîşê Kirdkî (zazakî)" vejîya



PK - Bi amadekerdişê grûba xebatî ya Vateyî kitabî "Rastnuştîşê Kirdkî (zazakî)" vejîya. Grûba xebatî ya Vateyî teboxê serra 1996 re nat lehçeyî kirdkî (zazakî) ser xebitîna. Înan heta nika des û hîrê kombiyayîşê Swêd û Almanya de viraştî. Her kombiyayîşê de nezdiyê 15 kesî yenî pê ser. Nê kombiyayîşan de semedê gramer, rastnuştîş û terman ser o xebat bena.

Netîceyî nê kombiyayîşan VATE de çap benî. Heta nika vîst û çahar hûmarî kovara VATEyî vijîyayî.

No amnan Îstanbûl de qaydeyê rastnuştîşê ke des û hîrê kombiyayîşanî grûba xebatî ya Vateyî de sey meyîl, ameyî tespîtkerdiş sey kîtab amê çapkerdiş. No kitabî de taye term û çekûyî lehçeyî kirdkî (kirdmanckî, zazakî, dimilî,) ke kes her roj bi kar ano zi ameyî nustîş. Sey nimûne: Nameyî bajarî (sûkan), nameyî dewletan, zamîrî, nameyî rengan, nameyî hûmaran, ûsn.

No kîtab, Weşanxaneyî Vateyî Îstanbol de çapkerdo û keno vila.

Adresê waştîşî:

Şehîr Muhtar Mah.Nane Sok.

Kat: 3, No: 5/5

Beyoglu/Îstanbûl

Tel: +90- (0)212-244 94 14

e-post: butkan@hotmail.com.

Osman Baydemîr lew na Ala Tirkana



Amed - Heftêku viyert Amed de Komelê keyeyanî Şehîdan ê Amed verî banî wilayet de yew konser organîze kerd. Serana pey raya vêrîn Amed de yew konser bi marşê Mehtera dest ci kerd.

Serekî belediya Diyarbekîr Osman Baydemîr zi na konser de ca girot. Serekî komelê şehîdan Ahmet Büyükburç û wekîlî walî Ahmet Aydın yew ala tirkana û yew albumî şehîdanî tirkana da Osman Baydemîr. Osman Baydemîr lew na ala, berd xo çare û va: Pîrkanî ma no cumhuriyet awan kerd, ma gereka no cumhuriyetî verd ber.

Mesûd Barzanî hanc va: Dewleta kurdistan yew roj biyero awan kerdiş

Duhok - 23î elûl de serekî kurdistan Mesûd Barzanî amê tor festîvalê Duhok bi û qisêkerd. Mesûd Barzanî, na festîval piyere kurdan û roşnîvanî re firaz kerd. Barzanî halî peyîn ê Kurdistan û Iraq ser vindert. Barzanî destcikerdiş qisêkerdiş xo de roşnîvan re va ke o her çî raşt, yanî senîno o qede înan re vaco. Mesûd Barzanî roşnîvan re va ke şîma eşkenî, taybet destûrê Iraq û persa Kerkûk û ê persanî bînan ser, vînayê xo bi azad biyarî zîwan.

Mesûd Barzanî hanc ard zîwan ke heqî kurdan est ke dewletê xo awan bikerî û qisêkerdiş xo îna rûmna: Kurd yew neteweya û kurdistan bê rizayî kurdan ameya parçekerdiş. Awan kerdiş dewleta kurdistan persa zemana û yew roj dewleta kurdistan awan bo.



KOMKAR-Almanya kongre xo ya 19. viraşt

